SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ TAM METİN KİTABI

EDİTÖR:

DR. LEMAN KUZU

SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ TAM METİN KİTABI

MUNZUR ZİRVEİ
2. ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ
31 MAYIS 2020
TUNCELİ

EDİTÖR:

DR. LEMAN KUZU

UBAK YAYINEVİ ®

(TC. KÜLTÜR VE TURİZM BAKANLIĞI YAYINEVİ RUHSAT NUMARASI : 2018/42945)
TÜRKİYE

munzurkongresi@gmail.com

www.ubak.org.tr https:// www.munzurkongresi.org

Bu kitabın tüm hakları UBAK Yayınevi'ne aittir.
Yazarlar etik ve hukuki olarak eserlerinden sorumludurlar.
UBAK Publications – 2020 ©

Yayın Tarihi :08 .06.2020
ISBN: 978-605-06766-4-8

KONGRE KÜNYESİ

KONGRE ADI

MUNZUR ZİRVESİ
2. ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ

TARİHİ VE YERİ

31 MAYIS 2020
TUNCELİ

DÜZENLEYEN KURUMU

UBAK Uluslararası Bilimler Akademisi Derneği

KONGRE DÜZENLEME KURULU

Kongre Başkanı: Doç. Dr. Yeliz Çakır Sahilli
Düzenleme Kurulu Başkanı: Doç. Dr. Ufuk Aydın
Düzenleme Kurulu Başkan Yrd.: Dr. Gültekin Gürçay
Düzenleme Kurulu Üyesi: Dr. Nadire Kantarcıoğlu
Düzenleme Kurulu Üyesi: Dr. Leman Kuzu
Düzenleme Kurulu Üyesi: Use Dergisi Editörlüğü
Düzenleme Kurulu Üyesi: Euroasia Dergisi Editörlüğü
Düzenleme Kurulu Üyesi: Use Dergisi Editörlüğü
Düzenleme Kurulu Üyesi: Ubak Uluslararası Bilimler Akademisi Yayinevi Editörlüğü
Genel Koordinatör: Amaneh Manafidizaji

YABANCI KONUŞMACILAR

Еремеев Александр (Rusya Tomsk Devlet Üniversitesi)- Rusya
Aynurə Əliyeva (Azərbaycan Dövlət Pedaqoji Universiteti) - Azerbaycan
Sevinc Sadıqova (Azərbaycan Dövlət Pedaqoji Universiteti) – Azerbaycan
Mehdi Meskini Heydarlou (Osmangazi Üniversitesi) **–** İran
Bashar Ibrahim (Süleyman Demirel Üniversitesi) - Irak
G. Botabayev (SILK WAY Uluslararası Üniversitesi) **–** Kazakistan
Sawsan Abdul Karim Ghanawi (Jinan University) - Lübnan

KONGRE DİLLERİ

TÜRKÇE (Tüm Lehçeleri) - İNGİLİZCE - RUSÇA - FARSÇA - ÇİNCE - ARAPÇA

BİLİM VE DANIŞMA KURULU

Dr. Gulmira ABDİRASULOVA
Kazak Devlet Kızlar Pedagoji Üniversitesi

Prof. Dr. Yunir ABDRAHIMOV
Ufa State Petroleum Technological University

Dr. Lale Sariye AKAN
Ankara Yıldırım Beyazıt Üniversitesi

Prof. Dr. Burcu Semin AKEL
Kültür Üniversitesi

Dr. Maha Hamdan ALANAZİ
Riyad Kral Abdülaziz Teknoloji Enstitüsü

Dr. Dzhakipbek Altaevich ALTAYEV
Al – Farabi Kazak Milli Üniversitesi

Doç. Dr. Nurhan AYDIN
Kafkas Üniversitesi

Dr. Mehmet Fırat BARAN
Mardin Artuklu Üniversitesi

Dr. Amina Salihi BAYERO
Yusuf Maitama Sule Üniversitesi

Dr. Karligash BAYTANASOVA
Al – Farabi Kazak Milli Üniversitesi

Dr. Baurcan BOTAKARAEV
Hoca Ahmet Yesevi Üniversitesi

Dr. Ahmad Sharif FAKHEER
Ürdün Devlet Üniversitesi

Doç. Dr. Abbas GHAFFARI
Tebriz Üniversitesi

Prof. Dr. Ariz Avaz GOZALOV
Moskova Devlet Üniversitesi

Dr. Ahmet GÜMÜŞ
İstanbul Aydın Üniversitesi

Prof. Dr. Gulzar İBRAGİMOVA
Bakü Avrasya Üniversitesi

Doç. Dr. Dilorom HAMROEVA
Özbekistan Bilimler Akademisi

Dr. Cihandar HASANHANOĞLU
Başkent Üniversitesi

Dr. Bazarhan İMANGALİYEVA
K.Zhubanov Aktobe Devlet Bölge Üniversitesi

Dr. Keles Nurmaşulı JAYLIBAY
Kazak Devlet Kızlar Pedagoji Üniversitesi

Dr. Mamatkuli Jurayev
Özbekistan Bilim Akademisi

Dr. Kalemkas KALIBAEVA
Kazak Devlet Kızlar Pedagoji Üniversitesi

Dr. Bouaraour Kamel
Ghardaia Üniversitesi

Doç. Dr. Tüba KARAHİSAR

Doç Dr. Mehmet KAYA
Dicle Üniversitesi

Prof Dr. Bülent KURTİŞOĞLU
Ardahan Üniversitesi

Doç Dr. Elif AKPINAR KÜLEKÇİ
Atatürk Üniversitesi

Sonali MALHOTRA
Delhi Balbahtri Academy

Dr. Alia R. MASALİMOVA
Al – Farabi Kazak Milli Üniversitesi

Prof. Muntazir MEHDI
Pakistan Language Academy

Dr. Amanbay MOLDIBAEV
Taraz Devlet Pedagoji Üniversitesi

Doç. Dr. Yaprak I. OZDEMIR
Karadeniz Teknik Üniversitesi

Dr. Yeliz ÇAKIR SAHİLLİ
Munzur Üniversitesi

Dr. Ayslu B. SARSEKENOVA
Orleu Milli Kalkınma Enstitüsü

Doç. Dr. Işık SEZEN
Atatürk Üniversitesi

Prof. Dr. Sibel SİLİCİ
Erciyes Üniversitesi

Dr. Gulşat ŞUGAYEVA
Dosmukhamedov Atyrau Devlet Üniversitesi

Doç. Dr. Yeliz KINDAP TEPE
Cumhuriyet Üniversitesi

Dr. K.A. TLEUBERGENOVA
Kazak Devlet Kızlar Pedagoji Üniversitesi

Dr. Cholpon TOKTOSUNOVA
Rasulbekov Kırgız Ekonomi Üniversitesi

Doç. Dr. Yıldırım İsmail TOSUN
Şırnak Üniversitesi

Dr. Botagul TURGUNBAEVA
Kazak Devlet Kızlar Pedagoji Üniversitesi

Dr. Dinarakhan TURSUNALİEVA
Rasulbekov Kırgız Ekonomi Üniversitesi

Prof. Dr. Akbar VALADBIGI
Urumiye Üniversitesi

Dr. Yang ZİTONG
Wuhan Üniversitesi

Doç. Dr. Mine GÖZÜBÜYÜK TAMER
Karadeniz Teknik Üniversitesi

MUNZUR ZİRVESİ
2. ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ
2. ULUSLARARASI UYGULAMALI BİLİMLER KONGRESİ

31 MAYIS 2020
TUNCELİ
KONGRE PROGRAMI

NOT:

- **Sunum Süresi Her Bildiri İçin 15 Dakikadır.**
- **Sunumlar skype üzerinden ve power point ile anlatılacaktır. Her oturum için gurup oluşturulacaktır. Sunum yapan katılımcı ekranın diğer katılımcılar ile paylaşacaktır.**
- **(skype ile aradığımızda aşağıda sağ koşede iki tane üstüste kareden ekranı paylaştan yapılacaktır.)**

MUNZUR ZİRVESİ
2. ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ
2. ULUSLARARASI UYGULAMALI BİLİMLER KONGRESİ
31 MAYIS 2020 - TUNCELİ

31 MAYIS 2020

UBAK 1	UBAK 2	UBAK 3
OTURUM 1 **10:00 - 12: 00** **OTURUM BAŞKANI: DR. GÜLTEKİN GÜRÇAY**	**OTURUM 1** **10:00 - 12:00** **OTURUM BAŞKANI: DR. NADİRE KANTARCIOĞLU**	**OTURUM 1** **10:00 - 12:00** **OTURUM BAŞKANI: ÖĞR. GÖR. DR. BASHAR IBRAHIM**
DR. ZAFER AÇAR **Berawırdkırına Hın Bıwêjên Kurdî Û Tırkî Yên Têkılî Hın Ezayên Însan**	DR. ÖĞRT. ÜYESİ SÜLEYMAN KASAP **Türkiye'de Kürt-Türk Çift Dilli Öğrencilerde Ana Dil Bozumu**	YADİGAR ÇEVİK DURMAZ EMİNE KAPLAN SERİN **Psikiyatri Kliniğinde Yatan Psikiyatri Hastalarının Fiziksel Sağlık Durumu Ve Konstipasyon Prevalansınının Belirlenmesi**
DR. ZAFER AÇAR **Dengsazıya Kurmancî Û Pırsyara Nîşankırına Dengên Derî Alfabeya Standart A Latînî**	DR. ÖĞRT. ÜYESİ SÜLEYMAN KASAP **Yabancı Dil Öğretimi ve Dil Benliği**	DOÇ. DR.ÖMER KILIÇ PROF. DR. ŞİNASİ YILDIRIMLI **Çelikhan İlçesi (Adıyaman) Ve Çevresi Florasında Bulunan Bazı Geofit Bitkiler**
ARŞ. GÖR. NAZAN YEŞİLKAYA **David Hume'un Yapay Adalet Anlayışı**	DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **Manyas Kuş Cenneti Milli Parkı Alan Gezisi Yansımaları**	ECZACI MERYEM KÖK DOÇ. DR.ÖMER KILIÇ **Osmaniye İli (Türkiye) Etnobotaniğine Katkılar**

AYNURƏ ƏLİYEVA **Füzulinin "Leyli və Məcnun" Poemasında İşlənmiş Antroponim Və Toponimlər**	DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **İzmir Alan Gezisi: İzmir Kuş Cenneti Milli Parkı, Doğa Tarihi Müzesi, Botanik Bahçesi**	DR. ÖĞR. ÜYESİ HAMİT USLU **Kimyasal Ajanlarla Oluşturulan Deneysel Diyabet Modelleri**
SEVİNC SADIQOVA **Ədəbi Dildə Arxaikləşmiş Sifətlər Qərbi Azərbaycan Şivələrində**	EZGİ ERSOY DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **Kanser Öğrencilere Ne Çağrıştırıyor? Bir Kit Çalışması**	DR. ÖĞR. ÜYESİ GÖZDE ATİLA USLU **Nörodejeneratif Bir Hastalık Olan Parkinson'un Deneysel Olarak Oluşturulması**
HATİCE DURAN OKUR DOÇ. DR. YAŞAR KAYA **Tüketim Kültürünün Instagram'daki Yansımaları**	CEMRE ATAY ÇANKAYA DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **Lise Öğrencilerinin Prokaryot Ve Ökaryot Kavramları İle İlgili Bilişsel Yapıları: Kit**	DR. ÖĞR. ÜYESİ FATİH AHMET ERULAŞ **Siirt Yaş Fıstık Kabuğunun Antioksidant Kapasitesi, Bazı Element Kompozisyonu Ve Meme Kanseri Hücre Hattı Üzerine Etkisi**
DR. ÖĞR. ÜYESİ MERVE YILDIRIM **3D Sokak Sanatının Optik İllizyonu**	SEKVAN YİMEZ PROF. DR. ZEKAİ PEHLEVAN **Üniversite Öğrencilerinin Spor Yapmasını Etkileyen Faktörlerinin Belirlenmesi: Mersin Üniversitesi Örneği**	DR. ÖĞRENCİSİ. MEHDI MESKINI HEYDARLOU ÖĞR. GÖR. DR. BASHAR IBRAHIM **Toplulum Kökenli Pnömonilerde Çok İlaca Dirençli Gram-Negatif Bakteriler**
DR. ÖĞR. ÜYESİ FATMA AYHAN **Türklerde Dövme Geleneği**	ESRA AYTAÇ DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **Öğrencilerin Yenilenebilir Ve Yenilenemez Enerji Hakkındaki Bilişsel Yapıları**	ÖĞR. GÖR. DR. BASHAR IBRAHIM DR. ÖĞRENCİSİ. MEHDI MESKINI HEYDARLOU **Probiyotiklerin Sağlık Alanında Kullanımı Ve Faydalarının Sistematik Araştırılması**
DR. ÖĞR. ÜYESİ FATMA AYHAN **Türk Kültüründe Yas Adeti ve Sığıtçı (Ağlayıcı)**	DR. ÖĞRETİM ÜYESİ MUSTAFA SOLMAZ **Dijital Toplum Ve Zygmunt Bauman'ın Sosyal Teorisi**	
DR. FATMA ESEN **Jeomiras Nitelikli Bir Doğal Taş: Bayburt Taşı**	Еремеев АЛЕКСАНДР **СОЦИОЛОГИЧЕСКИЙ АНАЛИЗ ЕВРАЗИЙСТВА**	
SAWSAN ABDUL KARIM GHANAWI **إستخدام تكنولوجيا المعلومات وعلاقتها بالأداء الوظيفي للعاملينفي قطاع الإتصالات**		

UBAK 1	UBAK2	UBAK 3
OTURUM 2 **13:00 – 15:00** **OTURUM BAŞKANI**:	**OTURUM 2** **13:00 – 15:00** **OTURUM BAŞKANI: DR. LEMAN KUZU**	**OTURUM 2** **13:00– 15:00** **OTURUM BAŞKANI: DOÇ. DR. UFUK AYDIN**
ARŞ. GÖR. OKAN MERT KATİPOĞLU PROF. DR. REŞAT ACAR **İstatistiksel Homojenlik Testleri İle Akım Verilerindeki Değişim Noktasının İncelenmesi**	ALİ EREN DEMİR **Çemişgezek'teki Alevi Köyleri Ve Ocakları**	DOÇ. DR. UFUK AYDIN **Kuzey, Doğu Ve Kuzeydoğu Anadolu Fay Zonları İçin Sismik Risk Çalışması**
ARŞ. GÖR. OKAN MERT KATİPOĞLU PROF. DR. REŞAT ACAR **Standart Yağış İndeksi İle Kuraklık Karakteristikleri Ve Sınıflarının İncelenmesi**	DR. ÖĞR. ÜYESİ MERYEM BERRİN BULUT **Manevi Bağlanma Biçimleri (Yakınlık, Benlik Modelleri Ve Ayrılma Protestosu): Kadın Ve Erkekler Birbirinden Farklılaşıyor Mu?**	SERİF RUZGAR PROF.DR. MUJDAT CAGLAR **The Effect Of SiO2 Thickness On Pentacene Based OFET Performance**
ADEM RÜZGAR **1957-2011 Yılları Arasında Liselerde Okutulan Kimya I Ders Kitabı Müfredatlarının Karşılaştırılarak İncelenmesi Ve Yeni Öneriler**	SERTAÇ ZOBU MELEK YURDAKUL **Müşteri Şikayetlerine Yönelik Çözüm Odaklı Yaklaşımlar: Havayolu Taşımacılığında Bir Uygulama**	SERİF RUZGAR **Optimizing The Electrical Performance Of The p-NiO/n-Si Diodes**
ADEM RÜZGAR **Meslek Yüksek Okulları Kimya Ve Kimyasal İşleme Teknolojileri Bölümü, Kimya Teknolojisi Programı Ders Müfredatlarının Karşılatırılarak İncelenmesi Ve Yeni Müfredat Önerileri**	EMEK ASLI CİNEL **Küresel Para Politikalarının İşlerliği Ve Alternatif Politikalar**	PROF.DR. MENDERES LEVENT YL. ÖĞRENCİSİ ÜNVER OĞUZHAN LEVENT **Deri Sanayisi Atık Sularından Krom-VI'nın Farklı Pomza Numuneleri Ve Granül Aktif Karbon (GAC) İle Giderimi**
DEMET ÖZTARAKCI DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN DOÇ. DR. AYHAN ÇİNİCİ **Öğretmen Adaylarının Çevre Dostu Davranışları İle Çevre Kimliklerinin İlişkisi**	ÖĞR. GÖR. BURAK ERCOŞKUN DR. ÖĞR. ÜYESİ EMRAH KONURALP **Göç Ve Göçün Etkileri Karşısında Merkezi Yönetim-Yerel Yönetim İlişkisi: Reslog Projesi Üzerinden Bir Değerlendirme**	PROF.DR. MENDERES LEVENT YL. ÖĞRENCİSİ ÜNVER OĞUZHAN LEVENT **Deri Sanayisi Atık Sularından Krom-VI'nın Çeşitli Zeolitler Ve Toz Aktif Karbon(PAC) İle Giderimi**

DEMET ÖZTARAKCI DOÇ. DR. GÜLCAN ÇETİN **Öğretmen Adaylarının Çevre Dostu Kavramına İlişkin Algıları**		ÖĞR. GÖR. BURAK ERCOŞKUN DR. ÖĞR. ÜYESİ EMRAH KONURALP **Ekonomik Krizler İle Sermaye Birikim Modelleri Arasındaki Nedensellik İlişkisi: Güney Kore Örneği**		ARŞ. GÖR. AYBİKE ÜSTÜNDAĞ DOÇ. DR. ÇETİN GENCER **Ayran Makinesinin TIA Portal Üzerinde Tasarımı Ve Plcsım İle Simülasyonu**
DR. MELEK ZOR **Erzurum'da Doğal Olarak Yetişen *Mentha longifolia, Chenopodium album ve Plantago major* Yenilebilir Bitkilerinin Bileşim Ve Sağlık Katkıları Üzerine Bir Araştırma**		YUNUS EMRE KARATAŞ **Sosyal Güvenlik Kurumu Verilerinde Meydana Gelen Değişimlerin Bağlanım Analizlerinin Yapılması**		AYTEN GEÇMEZ ÇETİN GENÇER **Yapay Sinir Ağları ile Rüzgar Enerjisi Üretimi Tahmini Adıyaman Örnek Çalışması**
DR. ÖĞR. ÜYESİ HALİT SEYFETTİN ATLI TAYFUN DÖLEK DOÇ. DR. NURHAN KESKİN **Siirt Yöresinde Yetiştirilen Bazı Üzüm Çeşitlerinin Göz Verimliliklerinin Belirlenmesi Ve Farklı Göz Şarjı Uygulamalarının Verim Ve Kaliteye Etkisi**		SERDAL SEVEN FERAHİM YEŞİLYURT ZEYNEP DENİZ SEVEN **6 Yaştan 19 Yaşa Utangaç Çocukların Problem Davranış Ve Bağlanma Durumlarının Boylamsal Olarak İncelenmesi**		
DR. ÖĞR. ÜYESİ HALİT SEYFETTİN ATLI HALİL İBRAHİM GÜNDÜZ PROF. DR. AHMET KAZANKAYA **Horoz Karası Üzüm Çeşidinde, Bilezik Alma Ve Gibberellik Asit Uygulamalarının Verim Ve Kalite Üzerine Etkileri**		ZEYNEP DENİZ SEVEN SERDAL SEVEN **Ebeveynlerin 3 Yaş Çocuklarıyla Sanat Aktivitesindeki Etkileşimlerinin İncelenmesi**		
		G.BOTABAYEV N.TOKSANBAYEVA **ОҚЫТУШЫНЫҢ АРНАЙЫ ҚАБІЛЕТІН ДАМЫТУҒА ПЕДАГОГИКАЛЫҚ ТОЛЕРАНТТЫЛЫҚТЫҢ ӘСЕРІН ТЕОРИЯЛЫҚ ЖӘНЕ ЭКСПЕРИМЕНТТІК ТАЛДАУ**		
		MELEK AKDOĞAN GEDİK		

		Cinsiyete Duyarlı Bütçeleme Ve Kamu Harcamaları Politikası		

İÇİNDEKİLER

KONGRE KÜNYESİ	
BİLİM VE DANIŞMA KURULU	
KONGRE PROGRAMI	
İÇİNDEKİLER	
SÖZLÜ SUNULMUŞ BİLDİRİ TAM METİNLERİ	
Zafer Açar *BERAWIRDKIRINA HIN BIWÊJÊN KURDÎ Û TIRKÎ YÊN TÊKILÎ HIN EZAYÊN ÎNSAN*	1
Zafer Açar *DENGSAZIYA KURMANCÎ Û PIRSYARA NÎŞANKIRINA DENGÊN DERÎ ALFABEYA STANDART A LATÎNÎ*	15
Aynurə ƏLİYEVA *FÜZULİNİN "LEYLİ VƏ MƏCNUN" POEMASINDA İŞLƏNMİŞ ANTROPONİM VƏ TOPONİMLƏR*	27
Sevinc Sadıqova *ƏDƏBİ DİLDƏ ARXAİKLƏŞMİŞ SİFƏTLƏR QƏRBİ AZƏRBAYCAN ŞİVƏLƏRİNDƏ*	35
Hatice Duran OKUR & Yaşar KAYA *TÜKETİM KÜLTÜRÜNÜN INSTAGRAM'DAKİ YANSIMALARI*	41
Merve YILDIRIM *3D SOKAK SANATININ OPTİK İLLİZYONU*	56
Fatma AYHAN *TÜRK KÜLTÜRÜNDE YAS ADETİ VE SIĞITÇI (AĞLAYICI)*	65
Fatma AYHAN *TÜRK KÜLTÜRÜNDE DÖVME*	76
Süleyman KASAP *ANA DİL BOZUMU*	92
Ezgi Ersoy & Gülcan Çetin *KANSER ÖĞRENCİLERE NE ÇAĞRIŞTIRIYOR? BİR KİT ÇALIŞMASI*	98
Sekvan YİMEZ & Zekai PEHLEVAN *ÜNİVERSİTE ÖĞRENCİLERİNİN SPOR YAPMASINI ETKİLEYEN FAKTÖRLERİNİN BELİRLENMESİ: MERSİN ÜNİVERSİTESİ ÖRNEĞİ*	106
Mustafa SOLMAZ *DİJİTAL TOPLUM VE ZYGMUNT BAUMAN'IN SOSYAL TEORİSİ*	117
Ali Eren DEMİR *ÇEMİŞGEZEK'TEKİ ALEVİ KÖYLERİ VE OCAKLARI*	126
Sertaç Zobu & Melek Yurdakul *MÜŞTERİ ŞİKAYETLERİNE YÖNELİK ÇÖZÜM ODAKLI YAKLAŞIMLAR: HAVAYOLU TAŞIMACILIĞINDA BİR UYGULAMA*	138
Emek ASLI CİNEL *KÜRESEL PARA POLİTİKALARININ İŞLERLİĞİ VE ALTERNATİF POLİTİKALAR*	153
Serdal SEVEN & Ferahim YEŞİLYURT & Zeynep Deniz SEVEN *6 YAŞTAN 19 YAŞA UTANGAÇ ÇOCUKLARIN PROBLEM DAVRANIŞ VE BAĞLANMA DURUMLARININ BOYLAMSAL OLARAK İNCELENMESİ*	161
Zeynep Deniz SEVEN & Serdal SEVEN *EBEVEYNLERİN 3 YAŞ ÇOCUKLARIYLA SANAT AKTİVİTESİNDEKİ ETKİLEŞİMLERİNİN İNCELENMESİ*	170

BERAWIRDKIRINA HIN BIWÊJÊN KURDÎ Û TIRKÎ YÊN TÊKILÎ HIN EZAYÊN ÎNSAN

Dr. Zafer Açar
zafer13acar65@gmail.com

KURTE

Biwêj wekî îfadeyên watedar ên ziman, hem di axaftinê û hem jî di nivîsê de bikarbar in û rêyek in meriv pê dikare mebesta xwe baştir diyar bike û bi peyvekê çend peyvan an jî bi çend peyvan meseleyekê vebêje.

Îja dema merî biwêjên zimanan, xusûsen jî zimanên cîran an jî zimanên kontaktê, dide ber hev tê dertê ku hevparî hene di hin biwêjan de; carna bi awayekî şiklî, carna bi awayekî wateyî û carna jî bi herdu awayan. Wekî wê; ji bo ku kurdî û tirkî du zimanên cîran in û kar li hev kirine/kontakta wan çêbûye, di van herdu zimanan de biwêjên hevwate balê dikişînin ser xwe. Di vê gotara xwe de em ê ji van biwêjên hevpar an jî nêzîk ên têkilî hin ezayên însan pêşkeş bikin, ji herdu zimanan nimûneyan bidin û wan berawird bikin. Bi vê em dixwazin nîşan bidin ku di zimanan de hevpariya biwêjan heye û ziman cuda bin jî pêdivî û teşeyên axaftin û xweîfadekirinê yên însanên zimancuda wekî hev an jî nêzî hev in.

Peyvên Sereke: Biwêj, Biwêjên Hevpar, Biwêjên Têkilî Hin Ezayên Însan

ÖZET

Bir dilde anlamlı ifadeler olarak deyimler, hem yazıda hem de konuşmada kullanışlıdırlar ve bu ifadelerle bazen bir kelimeyle birkaç kelimeyi bazen de birkaç kelimeyle bir meseleyi anlatabilme imkânı sağlamaktadırlar.

Böylelikle farklı dillerdeki deyimleri karşılaştırdığımızda özellikle de komşu diller ya da etkileşim içinde olan dillerde, ortak deyimlerle karşılaşırız ki bu deyimlerdeki ortaklık; bazen şekil yönüyle, bazen anlamsal olarak, kimi zaman da her iki yönden de karşımıza çıkmaktadır. Bundan dolayı, Kürtçe ve Türkçe komşu ve etkileşim içinde olan diller olarak bu ortak veya benzer deyimler konusunda dikkat çekmektedirler.

Bu çalışmamızda bu ortak veya benzer deyimlerden insan azalarıyla alaklı olanlarından bazılarını paylaşacağız ve bu deyimleri her iki dilden örnekler vermek suretiyle karşılaştıracağız. Bununla, dilleri farklı olsa bile insanların benzer ifadeler kullanabileceğini deyimler üzerinden göstermeye çalışacağız.

Anahtar Kelimeler: Deyim, Ortak Deyimler, İnsan Azalarıyla Alakalı Bazı Deyimler

Destpêk

Biwêj bi wateya xwe ya ferhengî ew peyv an komepeyv in ku kar, rûdan û wateyan dihewînin û piranî wateyên mecazî li xwe digirin. Herwiha ew ji bo vegotinê dewlemend û kêş bikin tên bikaranîn. Di hemî zimanan de biwêj û gotinên pêşiyan wekî gotinên qalib hene û yek ji rêya bitesîrkirina vegotinê ne.

Biwêj digel ku ji aliyê hin kesên diyar ve hatine derxistin jî, her ku ser wan re dem û dewran derbas bûne êdî bûne malê giştî yê gel. Biwêj ji tecrube, ceribandin û darêzên bi sedsalan ên jîrtiya hest û ramanên dê û bavan derketine.[1]

Piranî ev pey/komepeyv li dor lêkerekê têne pê û bi awayên xwe yên xwerû digel lêkerê raderî tên bilêvkirin wekî; *jê vegerîn*, *destê xwe jê şûştin*, *guh nedan* û wd. Lê dema di axaftin û nivîsê de tên bikaranîn hin hêmanên wê tên guhertin, bo nimûne; lêker li gorî demê tên kişandin, nav, daçek û cînav jî li gor dem û rewşê dikarin biguherin.

Kurdî ji aliyê biwêj û gotinên pêşiyan ve zimanekî dewlemend e. Ji ber erdnîgariya kurdan miletê kurd herdem ji miletên derdorê xwe re di nav têkiliyê de bûye. Ji wan tesîr girtiye û ew tesîr kirine. Gelên ereb, tirk/azerî/turkmen, faris, hin gelên din ên Îranî, ermenî, gurcî, siryan, cihû bi kurdan re cîran bûne û di nav van gelan de her danûstana çandî hebûye.

Wekî gelek cureyên folklorê biwêj û gotinên pêşiyan jî cureyên girîng in û di xwe de hêmanên hêja dihewînin. Ew heye ku piranî ji çîrok an jî metelokekê tên heta dibe ku sernavê çîrok an metelokekê bin. Helbet hemî ne bingehçîrok in lê yên bingehçîrok jî yên din jî hin hêmanên rêzimanî, wateyên mecazî, devok û zaraveyê dikarin sembolîze bikin. Û ji çend jêderan dertên. Biwêj û gotinên pêşiyan dikarin ji her biwarî bin û tesnîfa wan karekî dûr û dirêj e. Ji bo ku babeta me ne pênase û tesnîfkirina wan e, heta em ê xusûsî li ser cureyeke biwêjan tenê bisekinin, em nakevine nava wê behra kûr. Lê em dikarin ferqa biwêjan ji gotinên pêşiyan bi çend maddeyan wiha nîşan bidin:

Biwêj;

1. Ji gotinên pêşiyan cudatir şert nîne ew ji hevok an çend hevokan teşkîl bin. Ew dikarin peyvek jî bin, çend peyv an hevok jî.
2. Piranî di şiklê raderî de tên bikaranîn û gelek caran digel lêkerekê ew têne pê.
3. Hinek formên wê dibe ku peyvên bêwate bihewînin, hinek nimûneyên wan jî hevokên pirsê ne yan jî qalibên wekî wan ên cuda ne.

[1] Ayhan Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî -1*, weş: Lorya, 2017, Wan.

4. Biwêj piranî ji rûdanan derketine û bingeha wan mesele û çîrok in.[2]

Bi xebatên berawirdî û werger û lêkolînên ser zimanan derketiye ku îro em dizanin di gelek zimanan de biwêjên hevpar hene, çendî herdem neyê zanîn bê jêder kîjan ziman e/in jî ya ku em pê dizanin bi têkiliya nav însanan ziman tesîrê li hev dikin û danûstaneke tebiî pêk tê. Bo nimûne, Zeraq dema behsa têkiliya Kurdî û Tirkî dike ew li ser biwêjan sê kategoriyan derdixe pêş; 'Di hin biwêjan de mantiqa herdu zimanan wekî hev e, di hinekan de nêzî hev e û di hinekan de jî bi tenê peyvek ji gotinê diguhere.[3]

Ne tenê kurdî û tirkî, dema em li hin biwêjan dinêrin em dibînin ku ew di çend zimanan de hevpar in. Bo nimûne biwêja kurdî ya; 'Bi kevirekê du qûç xistin', di îngilizî de wekî; *Kill two birds with one stone*[4] û di tirkî de wekî; *Bir taşla iki kuş vurmak* e. Dîsa, biwêja tirkî; 'Dünyanın sonu değil ya' îngilizî de; *It's not the end of world* e û kurd jî vê biwêjê wekî; *ma qiyamet rabûye*?, bi kar tînin. Herwiha biwêja farisî 'به در می گویم دیوار گوش کن'[5] kurdî de wekî; *dîwaro ji te re dibêjim (filan kes) tu fêm bike* û tirkî jî wekî; *kızım sana söylüyorum gelinim sen anla* ye. Dîsa ji bo ku babeta me ser biwêjên têkilî ezayên însên e, em dikarin bêjin ku gelek zimanan de biwêjên hevpar hene. Ev biwêj carna an bi wateyî wekî hev in an jî carna hem bi wateyî hem bi şiklî wekî hev in. Bo nimûne; peyva 'pişt'di biwêjên hersê zimanên kurdî, tirkî û ingilizî de bi eynî wateyî heye ku ji wan em çend mînakan bidin; 'pişt dan pişt/back-to-back/sırt sırta vermek, pişta wî/ê şkestin/break one`s back(to do something)/beli kırılmak, pişta wî kişiyan/a crick in one's back/beli tutulmak, li pişt yekî sekinîn/get off (someone`s) back/arkasında durmak[6]

Wekî yên jorê nimûneyên biwêjên hevpar dikarin bên zêdekirin lê ji bo ku mijara me ya eslî ne ev e, ev çend mînak dê têrê bikin.

Babeta me ser biwêjên ezayên însanan e ku mumkîn e di her zimanî de ev biwêj hebin. Dema em li biwêjan dinêrin em dibînin ku li ser ezayên însan gelek biwêj çêbûne û her ezayek ji bilî wateya xwe ya rastîn pirî caran wateyeke mecazî li xwe girtiye. Her ezayek dema bûye endamê biwêjekê, wê temsîla heyîn, kar, hest an eşyayekê kiriye. Wekî di kurdî de bi van ezayan biwêj gelek in û berbelav in di tirkî de jî wisa ye û ev xebat dixwaze van cure biwêjan berawird bike û nêzî-dûrî, wekhevî-cudatiya wan li ser nimûneyekê, ji her ezayê, nîşan bike.

[2] Mustafa Borak, *Ferhenga Biwêjan*, weş: Enstituya Kurdî, r. 13, 2005, Stenbol
[3] Dilawer Zeraq, *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan*, weş: Enstîtuya Kurdî, r. 8, 2005, Stenbol,
[4] https://americanenglish.state.gov/files/ae/resource_files/in_the_loop_pages.pdf, 25.04. 2017 pêwendî hat kirin.

[5] Süreyya Beyzadeoğlu, "Durub-ı Emsal-i Osmaniye'de Türkçe ile Birlikte Arapça, Farsça ve Fransızca'da Ortak Kullanılan Atasözü ve Deyimler", İlmi Araştırmalar, sayı: 19, 2005, 23-33
[6] https: //www. easypacelearning. com/english-books/body-parts-idioms/1012-a-list-of-clothes-idioms-from-a-to-z-with-meanings, 27.04. 2017 pêwendî hat kirin.

Divê em vê jî bêjin di vê xebatê de em ê zêdetir biwêjên di forma lêkerî de bi kar bînin, em sifetên bi ezayên însan hatine çêkirin bi şiklê wan ên sifetî bi kar naynin. Nimûne, *sernerm, rûtirş, zikreş* û ww. bêyî raderê lêkerê nabin nimûneyê vê xebatê.

Ezayên însan yên ku em ê di vê xebata xwe de ser bisekinin du cure ne: yek, **ezayên navendî** yên laş wekî; 'Serî, rû, dil, mil, pişt, pê', ya din jî pênc **ezayên sehekê** ne; 'çav, guh, poz, ziman, dest/çerm.'

Ezayên Navendî

Ji bo ku ev ezayên hanê yan ji aliyê fîzîkî yan jî ji aliyê peywira xwe yan jî bi herdu aliyan ve navendî ne, nm: serî; gelek ezayan dihewîne, mil; çeng, zend, dest û tiliyan dihewîne, dil; ezayê sîstema gera xwînê ye herwiha ezayê hêst û dilînan e me ew wekî ezayên navendî bi nav kirin.

…

1. Serî: Di laşê însan de yek ji girîngtirîn eza ye. Serî di zanîn, edebiyat û folklorê de temsîla; 'aqil, fikir, îdare, serwerî, serkarî, hêz û desthilatê' dike. Peyva *ser* wekî gelek zimanan di kurdî de jî hem awayê wê yê xwerû, hem wekî pêvek(pêşgir û paşgir) bi kar tê û pê gelek peyv hatine darijtin.

Di biwêjên kurdî de *serî* berbelav e hem bi awayê *ser*, wekî; *ser guhê wî/ê li ser bûn*, hem wekî pêyvên pê darijtî re; *pê re serederî kirin/nekirin*, hem jî wekî *serî* bi kar tê; *hatin serî.*

Em ê ji hin biwêjên kurdî û tirkî yên hevmane yan jî nêzmane nimûneyan bidin, her biwêjê di risteyekê de bi kar bînin û nimûneyekê jî ji aliyê şiklî û wateyî ve raberî hev bikin.

Hatin serî; Pirt tişt hatin serê min.	**Başa gelmek**; Başıma gelmedik kalmadı.
Dan ser serê xwe; Li cem me mêvanan didin ser serê xwe.	**Baş üstünde tutmak**; Sizi baş üstünde tutacağız.
Serî di ber de; Ji bo ku me ji heqareta wan re dengê xwe nekir serê me di ber me de ye.	**Başı önünde olmak;** Başı önünde, utancından ne diyeceğini bilmedi.
Serî bûn wekî beraş/Serî bûn wekî meşka dew; Vê sibê de ez ber makîneyê me serê min bû mina beraşê aşan.	**Başı kazan gibi olmak;** Gürültüden başım kazan gibi oldu.
Ser seran; Emrê we ser serê min.	**Baş üstüne;** Baş üstüne efendim.
Çareya serê xwe nêrîn;	**Başının çaresine bakmak;**

Êdî em ê çareya serê xwe binêrin.	Büyüdün artık başının çaresine bakacaksın.
Aqibet serî/nexşe li serî bûn; Aqibet serê te be.	**Darısı başına olmak;** Ben sınavı geçim darısı başınıza.
Bi serê xwe man; Li vê dinê kesekî min nema ez bi serê xwe mam.	**Bir başına kalmak;** Sen gittikten sonra bir başıma kaldım.

Ev biwêjên jorê tenê çend nimûne ne ji herdu zimanan, helbet nimûneyên zêdetir dikarin bên dan. Dema em di ferhengên biwêjan de peyva *serî* digeriyan me dît ku ev peyv gelekî berbelav e. Raberkirina biwêjekê:

Serî bûn wekî beraş-Serî bûn wekî meşka dew/Başı kazan gibi olmak: Kesê ku serî diêşe yan jî serî gêj dibe û jê werê gurînî heye di sêrî de. Kurdî ji bo vê peyvên *beraş* û *meşk* (heta li hin deveran peyvên cuda yan jî biwêj di formeke cuda de bi kar tê), tirkî peyva *kazan* bi kar hatiye ku eynî rûdanê diyar dikin.

2. Rû: Wekî ezayekî navendî ye di pêş serî de. Ew di edebiyat û çanda gel de temsîla heyîn, nasname, ber, alî û ww. dike loma ji ber giringiya xwe ya di têkiliya însanan de ew di biwêjan de berbelav e.

Li rûyê hev nêrîn; Wisa li hev nekin sibê hûn ê rûyê hev binêrin.	**Birbirinin yüzüne bakmak;** Yarın birbirinizin yüzüne bakacağız.
Li rûyê wî/ê dan; Divê merî şerma yekî li rûyê wî nede.	**Yüzüne vurmak;** Ayıbını yüzüne vurmamalıydın.
Rûyê wî/ê negirtin; Rûyê min nagire ez jê bixwazim.	**Yüzü tutmamak;** Söylemek istedim ama yüzüm tutmadı.
Rûyê xwe jê badan; Rûyê xwe ji min banede.	**Yüz çevirmek;** Israrla hakikati kabul etmek istemeyenlerden yüz çevir.
Rûyê xwe tal/tirş kirin; Piştî wê gotinê rûyê xwe tal kir.	**Yüzünü ekşitmek;** Hoşuna gitmedi, yüzünü ekşitti.

Rûyê xwe jê badan/Yüz çevirmek: Ji yekî xeyidîn, ji yekî sar bûn. Di herdu zimanan de jî ev biwêj bi wateya xwe ya mecazî di heman wateyê de tê bikaranîn.

3. Dil: Çi şiklê wê yê şênber çi jî yê razber be ew yek ji girîgtirîn ezayê însan e. Herwiha ew çawa di sing de wekî ezayeke maddî xwedî peywirên girîng e, wekî ezayekî manewî jî ew navendî ye û girîng e. Dil ciyê hestan e û temsîla nîyet, xwestin, armanc, baweriyan û wd. dike. Di edebiyata klasîk de û di folklorê de pir tê bikaranîn. Di edebiyata klasîk de mijar piranî têkilî dil e. Di folklorê de, xweser jî di biwêj û gotinên pêşiyan de ev eza berbelav e. Di kurdî de wekî dil peyva *qelb* a erebî jî bi kar tê. Di tirkî de jî dîsa *kalp*, *yürek* û *gönül* carna di eynî wateyê de carna di wateyên cuda de tên bikaranîn. Em ê li jêrê çend nimûneyan ji herdu zimanên kurdî tirkî bidine ber hev:

Li gorî dilê wî/ê; Xwedê li gorî dilê te bide te.	**Gönlüne göre;** Allah gönlüne göre versin.
Dilê xwe jêre vekirin; Dilê xwe jêre veke.	**Kalbini açmak;** Git ona kalbini aç.
Dil şkandin; Tu carî dilê kesî neşkîne.	**Kalbini kırmak;** Onun kalbini kırdın.
Dil wî/ê hebûn/tunebûn; Dilê min tune wî karî bikim.	**Gönlü olmak/olmamak;** Gönlü yok bu işte.
Dilê wî/ê xwestin; Eger dilê te bixwaze tê bikî.	**Gönlü istemek;** Gönlün isterse yaparsın.
Dilê wî/ê jê man; Me hinekî da ber hev, dilê wî ji min ma.	**Gönlü kalmak;** Sanırım gönlü kaldı.
Dilê yekî kirîn; Here serdana wan, dilê wan bikire.	**Gönlünü kazanmak;** Öncelikle onların gönlünü kazanmalıyız.
Dilê wî/ê şewitîn; Min ew di wî halî de dît dilê min pê şewitî.	**Yüreği yanmak;** Yüreğim yandı onu o şekilde görünce.
Dilê wî daxkirin; Eşa wî wisa giran bû dilê merî dax dikir.	**Yüreğini dağlamak;** Acısı yürek dağladı.

Dil şkandin/Kalbini kırmak: Di herdu zimanan de bi wateya mecazî bi heman awayî ev biwêj heye, wate dil yekî ji xwe hiştin, yek dan xeyidandin û xemgîn kirin. Di kurdî de şûna dil *qelb* jî bi kar tê wekî; '*qelbê wî/ê şkand*'.

4. Mil: Bi tevî ling ji sê beşên laşê merî beşek e. Ew carna bi dest re tê bi heman wateyê carna herdu şûna hev de tên bikaranîn carna jî bi hev re. Ji ber ku em ê *dest* di qismê ezayên sehekê, şûna *çerm* de bi kar bînin lêre tenê em ê cî bidin mil.

Ev eza wateyên wekî; hêz, destek, piştgirî û girêdanê de dikare bê fêmkirin. Li jêr hin biwêjên kurdî û tirkî yên hevmane wiha ne:

Ketin milê yekî; Kete milê wî û çû.	**Birinin koluna girmek;** Arkadaşının koluna girdi, beraber gittiler.
Mil dan milê hev; Em ê mil bidin milê hev bixebitin.	**El ele vermek;** El ele verip çalışmalıyız.
Milê wî/ê bûn dar; Sibe da min hingî av kişand milê min bûne dar.	**Kolları kopmak;** Eşya taşımaktan kollarım koptu.
Zendû bendê xwe badan; Me zend û bendê xwe badan û me dest pê kir.	**Kolları sıvamak;** Kolları sıvayın ve işe başlayın.

Mil dan milê hev/El ele vermek: Ji bo qedandina karekî xebata çend kesan tê qestkirin. Dema însan karekî bi tena serê xwe bike zehmet e lê bi çend kesan re bike hem ew kar hêsan dibe hem jî zûtirî xilas dibe. Di kurdî de ji bo vî karî *mil*, tirkî de *dest* bi kar hatiye.

5. Pişt: Di biwêjên kurdî de mecazen maneyên wekî; hêz, destek, pêbawerî, fidakarî û ww. girtiye. Tirkî şûna vê peyvê hem peyva *sırt* hem ji peyva *bel* tê bikaranîn.

Pişta xwe pê ve girêdan; Pişta xwe bi wî ve girênede e yekî bê emniyet e.	**Bel bağlamak;** Ona bel bağlama, güvenilir biri değil o.
Pişta xwe dan kesekî/tiştekî; Pişta xwe nede eqrebayê xwe.	**Sırtını dönmek;** Dostlarına sırtını dönme.
Pişt dan pişt; Me pişt da hev û em bi ser ketin.	**Sırt sırta vermek;** Sırt sırta verip çalışacağız.
Ser piştê dirêjbûn; Min karê xwe qedand û ser piştê xwe dirêj kir.	**Sırt üstü uzanmak;** İşini bitirmiş, sırt üstü uzanmıştı.
Dan pişta xwe; Wî heta îro ez dam pişta xwe.	**Sırtına almak;** Beni sırtına alıp buralara kadar getirdi.

Destê xwe piştê dan; Wan destê xwe piştê dane loma wisa rihet e.	**Sırtını sıvazlamak;** Onlar sırtını sıvazlamazsa böyle yapmaz.
Pişta wî/ê nayê erdê; Wî deynê xwe da êdî pişta wî nayê erdê.	**Sırtı yere gelmemek;** Borcunu ödedi, artık sırtı yere gelmez.

Pişta xwe dan kesekî-tiştekî/Sırtını dönmek: Berê xwe ji kesekî yan jî tiştekî zivirandin, jê xeyidîn an jî dev jê berdan.

6. Pê: Di kurdî de belkî qasî dest berbelav nebe lê pê jî di biwêjan de gelekî hatiye bikaranîn. Pê temsîla hêz, biryar, rik, serdan û ww. dike.

Pê neçûn; Qe israr neke, pê min naçe wira.	**Ayak atmamak;** Bir daha oraya ayağını atmadı.
Pê kutan(erdê); Pê kutaye erdê, ji ya xwe venagere.	**Ayak diremek;** Ayak diredi, bir türlü kabul ettiremedik.
Li ser piyên xwe bûn/sekinîn/man; Ew digel ewqas tengasiyan jî li ser piyên xwe ma.	**Ayakta kalmak;** Her şeye rağmen ayakta kalmayı başardı.
Ser piyan razan; Îro pir westiya, hema ser piyan radizê.	**Ayakta uyumak;** Git biraz dinlen ayakta uyuyorsun.
Rakirine piyan; Wisa qêriya nexweşxane rakir ser piyan.	**Ayağa kaldırmak;** Bütün mahalleyi ayağa kaldırdı.
Ser piyan sekinîn; Em hêj ser piyên xwe disekinin.	**Ayakları üstünde durmak;** O ayakları üstünde durabilecek biri.
Piyên wî erdê negirtin; Wisa şa dibû piyên wî erdê nedigirtin.	**Ayakları yere değmemek;** Çok mutluydu ayakları yere değmiyordu.

Piyên wî/ê erdê negirtin/Ayakları yere değmemek: Hevwateya biwêja; *ji şabûna firîn* e. Ji bo kesê şa tê bikaranîn. Yanî wisa şadibû lê bû bifiriya.

Ezayên Sehekê:

Wekî ku tê zanîn her pênc ezayên bihîstinê yên însan; dîtin, bihîstin, bênkirin, tamkirin, destdan in ku ezayê wan bi rêzê; çav, guh, poz, ziman û dest[7] in.

[7] Ji bo vê ezayê çerm zêdetir lê tê. Lê di biwêjên kurdî de û di gelek biwaran de *dest* ezayê temaskirinê ye û ew zêdetir vê temsîlê dike.

Di kurdî de bi van her pênc ezayan biwêj gelek in û piranî di wateya mecazî de tên bikaranîn. Di van biwêjan de *dest*; temsîla hêz, îmkan, alîkarî û wd., *çav*; piranî wateya nihêrîn, xwestin û hin hestan de, *guh*; di wateya eleqe, haj û agahîgirtinê de, *poz*; di wateya eleqe, xwebînî û hin hestên din, *ziman*; jî di wateya gotin, axaftin û îfadeyê de dikare bê fêmkirin.

Di kurdî û tirkî de -ji ber ku herdu ziman û çand cîran in- biwêjên hevmane gelek in. Ji van biwêjan xusûsen jî pênc ezayên sehekê balê dikişînin. Em ê jêrê li ser nimûneyan hin biwêjên herdu zimanan ên hevmane bidine ber hev û ji wan em ê li ser nimûneyekê bisekinin, wateyên wan vêbêjin û raberî hev bikin.

1. **Çav:** Ev eza temsîla wateyên wekî, nêrîn, nîyet, baldarî, şahidî û wd. dike. Di biwêjan de berbelav e.

Çav berdan; Çav berdane nanê me.	**Göz koymak;** Ekmeğimize göz koydular.
Çavê xwe gerandin; Min çavê xwe lê gerand lê min nedît.	**Göz atmak;** Etrafa göz atıp geleceğim.
Ber çavê wî/ê ketin; Hêca ber çavê min ket lê niha nayê bîra min.	**Gözüne ilişmek;** Baktım ama gözüme ilişmedi.
Çav çavan nedîtin[8]; Rê wisa bi mij bû çav çavan nedidît.	**Göz gözü görmemek;** Yağışlı havadan dolayı göz gözü görmüyordu.
Bi çavê xwe dîtin; Min bi çavê xwe dît.	**Gözüyle görmek;** Kendi gözlerimle gördüm.
Çavên xwe jê revandin; Çavê xwe ji min direvand.	**Gözünü kaçırmak;** Sürekli gözünü kaçırıyordu.
Çavê te ronî; Kurê te hatiye, çavê te ronî!	**Gözün aydın;** Gözün aydın oğlun gelmiş!
Çav lê mayîn; Çavê wî li destê te ma.	**Gözü kalmak;** Çocukcağızın gözü kaldı.
Çav tirsandin; Divê tu çavê wî bitirsînî.	**Gözünü korkutmak;** Gözünü korkutmalısın bence.
Çav li rêyan bûn; Ev çend sal in çavê min li riya te ye.	**Gözü yolda olmak;** Gözlerim yollarda kaldı.

[8] Ev biwêj di romanên Eliyê Evdilrehman de wekî; "çavan çav nedîtin" derbas dibe. Ji wan tê der ku kurdên Kavkaz vê biwêjê cuda bi kar tînin.

Çav çavan nedîtin/göz gözü görmemek: Ji ber mij, duman an jî berf û bagerê pêşiya xwe nedîtin. Wekî ji herdu biwêjan diyar dibe ku hem ji aliyê şiklî ve hem jî ji aliyê wateyî ve wekhev in.

2. **Guh:** Di biwêjan de wateyên wekî; baldarî, qiymet, bihîstin û wd. li xwe digire. Ji ber ku ezayê sehkirin û bihîstinê ye biwêjên bi vê ezayê bi deng, gotin û xeberan re têkildar in.

Ser guhê wî/ê ser bûn; Bila ser guhê te ser bin, ew nereve.	**Gözü kulağı üzerinde olmak;** Gözün kulağın onda olsun, kaçmasın.
Pişt guhê xwe avêtin; Min ewqas jî gotê lê wî pişt guhê xwe avêt.	**Kulak arkası etmek;** O kadar da söyledim ama kulak arkası etti.
Guhdan/nedan; Guh nede wan gotinên beredayî.	**Kulak asmak/asmamak;** O boş sözlere kulak asma.
Ber guhê wî ketin; Hinek tişt ber guhê min ketin, gelo rast e?	**Kulağına gelmek/kulağına çalınmak;** Bazı şeyler kulağıma geldi, doğru mu acaba?
Guh lê giran bûn; Guh lê giran bûne êdî baş nabihîze.	**Kulağı ağır işitmek;** Kulakları ağır işitiyor, artık iyi duymuyor.
Guh badan/rakirin; Mamoste guhê xwendevanê xwe bada.	**Kulağını çekmek;** Öğretmen öğrencisinin kulaklarını çekti.
Guh lê bûn; Bêje, guhê min li te ye.	**Kulağı birinde olmak;** Söyle, kulağım sende.

Ser guhê wî/ê ser bûn/ Gözü kulağı üzerinde olmak: Parastin, lê miqat bûn. Ji biwêjan jî diyar dibe wateyên herduyan yek in lê biwêja kurdî de digel *guh* peyva *ser* hatiye bikaranîn lê ya tirkî de peyva *çav* bi guh re bi kar hatiye.

3. **Ziman:** Temsîla nasname, axaftin, gotin û wd. dike. Di kurdî de peyva *zar* jî di wateya ziman de tê bikaranîn.

Zimandirêjî kirin; Zimanê te zêde dirêj bûye.	**Dil uzatmak;** Senin dilin fazla uzamış.
Li ser zimanê wî/ê; Hema ser zimanê min e, ez ê bêjim.	**Dilinin ucunda;** Dilimin ucunda, söyleyeceğim.

Zimanê wî/ê vebûn; Dibê qey zimanê wî vebû, sibe da diaxive.	**Dili açılmak;** Dili açıldı sanki, sabahtan beri konuşuyor.
Zar/Ziman şirîn bûn; Zarê wî pir şirîn e.	**Tatlı dilli olmak;** Çok tatlı dilli biridir.
Zimanê xwe girtin; Zimanê xwe negirt û axivî.	**Dilini tutmak;** Dilini tutamadı, konuşmaya başladı.
Zimanê xwe xwarin; Tu çima naxivî, qey te zimanê xwe xwar?	**Dini yutmak;** Niye konuşmuyorsun, dilini mi yuttun?

Li ser zimanê wî/ê/Dilinin ucunda: Ev biwêj dema kesek dixwaze tiştekî bêje lê gotin nayê bîrê tê gotin. Di biwêja kurdî de gotin li ser ziman e lê di ya tirkî de gotin li pozika ziman e.

4. **Poz/difn/Bêvil[9]:** Ji ber ku ev eza bi çend peyvan bi kar tê li gorî deveran biwêjên cuda yan bi peyvên cuda heman biwêj tên dîtin.

Poz pê nekirin; Karê wî neeciband loma qet poz pê nekir.	**Burun kıvırmak;** İşini beğenmedi, burun kıvırdı.
Pozê wî/ê şewitîn; Baş bide xebatê bila pozê wî hinekî bişewite.	**Burnu sürtünmek;** İyice çalıştır ki burnu sürtünsün.
Difinê wî/ê re hatin; Êdî wisa kirine, pozê me re hatiye.	**Burnundan gelmek;** Öyle bir duruma getidiler ki artık burnumuzdan geldi.
Pozê wî/ê bilind bûn; Ew yekî pozbilind e.	**Burnu havada olmak;** O burnu havada biridir.

Poz pê nekirin/Burun kıvırmak: Guhnedan, qimetnedan, neecibandin. Di herdu biwêjan de wate yek e lê biwêja kurdî ji aliyê şiklî ve nerênî ye lê ya tirkî erênî ye.

[9] Ji ber ku di kurdî de çend navên poz hene û hemî jî bi kar tên me ew yek qebûl kirin.

5. **Dest:** Di biwêjan de berbelav tê bikaranîn. Temsîla hêz, îmkan, têkilî, xebat, dostanî û hezkirinê dike.

Dest avêtin; Ka werin, dest bavêjinê!	**El atmak;** Gelin, bir el atın!
Dest dan dest; Em ê dest bidin hev û bi ser kevin.	**El ele vermek;** Biz el ele vereceğiz ve başaracağız.
Dest danîn ser; Wan dest dane ser her tiştî.	**El koymak;** Her şeye el koymuşlar.
Ji dest nehatin; Tiştek ji destê min nayê.	**Elinden bir şey gelmemek;** Elimden bir şey gelmiyor.
Destê xwe nedan; Ez destê xwe nadimê.	**El sürmemek;** Elimi sürmeyeceğim.
Dest jê kişandin; Wan destê xwe ji vî karî kişandine.	**El çekmek;** Onlar elini bu işten çekmiş.
Ji dest çûn; Edî ji destê me çû.	**Elden çıkmak;** Artık elimizden çıktı.
Ber destê wî/ê mezin bûn; Ew ber destê min mezin bû.	**Elinde büyümek;** O elimde büyüdü.
Dest gihiştin; Destê wî nagihije min.	**Eli yetişmek;** Eli bana yetişmez.
Di dest de man; Ditirsim, wê di destê min de bimîne.	**Elinde kalmak;** Korkuyorum, elimde kalacak.
Destê wî/ê nihêrîn; Em li destê wî dinihêrin.	**Eline bakmak;** Biz onun eline bakıyoruz.

Ber destê wî/ê mezin bûn/Elinde büyümek: Ji aliyê kesekî ve hatin mezinkirin. Wate dîsa di herdu biwêjan de yeke lê di ya kurdî de wateya hînkirinê jî heye.

Ji bilî van biwêjên her pênc ezayên bihîstinê helbet yên din jî hene ku hinekên wan hevmane hinekên wan jî nêzmane ne. Dîsa hin biwêj jî hene ku wate yek in lê bi ezayên cuda tên îfadekirin, bo nimûne; *bûn benîştê devê xelqê/ hakın diline düşmek.*

Encam

Biwêj peyv an komepeyv in ku wekî gotinên temsîlî hin wateyan li xwe digirin û qest, îzah û rewşan diyar dikin. Ji ber ku biwêj piranî gelêrî ne nayê zanîn bê cara pêşîn kê ew gotine. Yanî tesbîtkirina biwêjan zor e ku meriv bêje ji vî zimanî derketine yan jî cara pêşîn di vî zimanî de bi kar hatiye.

Merî dikare biwêjan kategorîze bike û li gorî babet an cureyên wan tesbît bike. Me di vê nivîsara xwe de tenê behsa qismekî ji van biwêjan, biwêjên têkilî hin ezayên însan kir û yên kurdî û tirkî dane ber hev. Ev biwêjên ku di têkiliyên însanan de tên bilêvkirin piranî wateyên mecazî îfade dikin û di gelek zimanan de hene.

Di vê xebata xwe de, me ji biwêjên kurdî û tirkî yên têkilî şeş ezayên navendî; serî, rû, dil, mil, pişt û pê û biwêjên têkilî ezayên sehekê; çav, guh, ziman, poz û dest nimûne dan, me ew rûberî hev kirin û hem bi awayê şiklî û hem jî bi awayê wateyî me ew pêşkeş kirin.

Îja bi vê nivîsara me xuya bû ku; di zimanan de biwêjên hevwate gelek in û hinek ji wan hem ji aliyê şiklî û hem jî ji aliyê wateyî ve hema bêje wekî hev in. Kurdî û tirkî wekî du zimanên cîran tesir li hev kirine û ji zimanên din re jî danûstana çandî kirine. Wekî ku ji nimûneyên me yên biwêjên têkilî ezayên însan diyar dibin, herçiqas ne hêsan be merî tesbîta resenê biwêjekê bike ka cara pêşî di kîjan zimanî de derketiye jî, lê merî dikare bêje çi bi kontakta zimanan çi jî bi rêya wergerê be hin biwêj wekî hev an jî nêzî hev di zimanan de têne bikaranîn.

Jêder

Açar, Zafer, ‘Berawirdkirina Hin Biwêjên Kurdî û Tirkî Yên Tekilî Pênc Ezayên Însan’, Kovara Nûpelda, j. 24, 2017

Ayhan, Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî -1*, weş: Lorya, 2017, Wan.

Abbas, Nawal Fadhil & Younis, Lina Laith, ‘Body Parts Idioms: A Cross-Cultural Significance’, J. Of College Of Education For Women, vol. 20, 2009.

Dilawer, Zeraq, *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan*, weş: Enstîtuya Kurdî, 2005 Stenbol.

Farsça Türkçe Sözlük, amd: Mehmet Kanar, SAY Yayınları, 2008, Stenbol.

Hasan Çiftçi, ‘Ortak Atasözlerinin Hikayeleri: Farsî-Kurmancî-Zazakî’, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Mayıs 2016.

http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_content&view=frontpage&Itemid=1, 14. 01. 2017 pêwendî hat kirin.

https://americanenglish.state.gov/files/ae/resource_files/in_the_loop_pages.pdf, 25.04. 2017 pêwendî hat kirin.

https://www.easypacelearning.com/english-books/body-parts-idioms/1012-a-list-of-clothes-idioms-from-a-to-z-with-meanings, 27.04. 2017 pêwendî hat kirin.

https://www.english-area.com/paginas/idioms.pdf, 27.04. 2017 pêwendî hat kirin.

Mustafa Borak, *Ferhenga Biwêjan*, weş: Enstituya Kurdî, 2005, Stenbol.

Mehmet Öncü, *Ferhenga Biwêjan*, weş: Sîtav,

Mehmet Öncü, *Gotinên Pêşiyan*, weş: Enstîtuy Kurdî ya Stenbolê, 2009, Stenbol.

Seyfettin Altaylı, 'Atasözü Ve Deyimler Arasındaki Farklar', Karadeniz Araştırmaları, Bahar 2010, sayı 25: 125-134-pdf.

Süreyya Beyzadeoğlu, "Durub-ı Emsal-i Osmaniye'de Türkçe ile Birlikte Arapça, Farsça ve Fransızca'da Ortak Kullanılan Atasözü ve Deyimler", İlmi Araştırmalar, sayı: 19, 2005, 23-33-pdf.

MUNZUR 2.ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ
TUNCELİ
31 MAYIS 2020

DENGSAZIYA KURMANCÎ Û PIRSYARA NÎŞANKIRINA DENGÊN DERÎ ALFABEYA STANDART A LATÎNÎ

Dr. Zafer AÇAR
zafer13acar65@gmail.com

KURTE

Di zimanê kurdî de yek ji niqaşa herî girîng di derbarê dengsaziyê de, nîşankirina dengan û tîpan e ku hê jî ev niqaş didome. Digel bikaranîna alfabeyên cuda, bikaranîna dengan di nivîsê de pirsiyarek e û bi tesbîtkirina dengên deverî ev pirsiyar û raberiya ser wan dê berdewam bikin.

Di kurmancî de dengên standart ên nîşankirî, yên heyî lê bêtîp û yên deverî ku bi lêkolînên ser devokan dertên der; dê dengên kurmancî, awayê nîşankirin û tîpandina wan diyar bikin û dê sînorê dengsaziya kurmancî nîşan bidin.

Me jî di vê xebata xwe de bal kişand ser heşt dengên kurmancî yên derî alfabeya latînî; me li ser nîşankirina wan ji hin xebatên berê mînak nîşan dan û me bixwe jî ew bi hin nîşanan diyar kirin. Herwiha armanceke vê xebatê jî ew e ku; dixwaze giringiya sazkirina alfabeyeke dengan nîşan bide.

Peyvên Sereke: Dengsazî, Dengsaziya Kurmancî, Nîşankirina Dengan

ÖZET

Kürt dilinde fonetik alanında önemli tartışma konularından biri de seslerin ve harflerin işaretlenmesi konusudur ve bu tartışma devam etmektedir. Farklı alfabelerin kullanılmasının yanında, yazıda seslerin kullanılması sorunu yöresel seslerin tespitiyle bir sorun ve tartışma olarak devam edecektir.

Kurmanci Kürtçesinde işaretlenmiş standart sesler, var olan ama harflendirilmemiş sesler ve araştırmalarla ortaya çıkacak sesler; Kurmanci sesleri, işaretlendirme ve harflendirme biçimlerini gösterecek ve Kurmancinin fonetiğinin sınırlarını belirleyeceklerdir.

Biz de bu çalışmamızda Kürtçe (kurmancî) alfabede yer almayan sekiz tane sese dikkat çektik; bu seslerin işaretlenmesi konusunda daha önce yapılan çalışmalardan örnekler sunduk ayrıca işaretleme konusunda kendi tesbitlerimizi de belirttik. Diğer taraftan bu çalışmanın bir amacı da bir ses alfabesini tesbit etmenin önemine dikkat çekmektir.

Anahtar Kelimeler: Ses Bilgisi, Kurmancinin Fonetiği, Seslerin İşaretlenmesi

ABSTRACT

In Kurdish phonology one of the important matters of debate is marking voices and letters and this debate is going on. Besides the use of different alphabets, the issue of using voices in writing has become a problem with the detection of local voices and this debate will continue.

Standart voices marked in Kurmanji Kurdish, the voices that are available but not shown with a letter and the voices that will appear through researches will show the forms of marking and lettering and will determine the limitations of Kurmanji phonetics.

In the present study, we aimed to draw attention to eight sounds that do not exist in Kurdish (kurmancî) alphabet; presented examples from previous studies conducted on marking these sounds, and stipulated our own determinations in marking these vowels. On the other hand, another objective of the present study was to draw attention to the significance of determining a vocal alphabet.

Keywords: Phonetics, Kurmanji phonetics, Marking of sound

DESTPÊK

Di kurdî de pirbûna alfabeyan, tîpandin û nîşankirina dengan û navlêkirina cîderkên dengan kêşeyek e ku hêj li ser van mijaran gengeşî hene. Ji bilî dengên nîşankirî yên kurmancî dengên ku nehatine nîşankirin li gorî herdu alfabeyên erebî û latînî diguherin. Di alfabeya latînî ya kurmancî de dengên bêtîp ji alfabeya erebî ya kurmancî zêdetir in. Bo nimûne; ji her heşt dengên mijara xebata me(“ḥ/ح”ya qirikî, “ġ/غ”ya qirikî, herçar dengdarên nehilmî “ç, k, p, t,”, “l”ya lerzok û “r”ya bişid), herdu dengên qirikî ḥ/ح û ġ/غ di alfabeya erebî de hene, herwiha “l”ya lerzok û “r”ya bişid bi sembola “v” tê nîşankirin ku wê sembolê bi tîpên “l”ya normal û “r”ya normal ve datînin. Tenê di alfabeya erebî de herçar dengên nehilmî cî nagirin.

Di alfabeya kurmancî ya latînî de 31 tîp hene. Ji van 8 heb dengdêr 23 heb jî dengdar in. Ji bilî van 31 dengên nîşankirî hin deng jî hene ku di alfabeya latînî de berdêlî wan tîp tunene ku ew tîp ev in; Dengdêrên eynî(ع), dengdarên nehilmî “ç, k, p, t,”, “ḥ/ح”ya qirikî, “ġ/غ”ya qirikî. Ji bilî van dengan dengên ku li ser niqaş hatine kirin jî hene wekî; “r”ya lerzok û “l”ya bişid. Ji bilî van dengên navborî, hin dengên kurmancî ên deverî hene ku hinekên wan bi lêkolînên ser devokan hatine/tên tesbîtkirin.

Em ê di vê xebata xwe de berê xwe bidin dengên standart ên kurmancî, ji navlêkirinên berê xwe sûdê bigirin, di derbarê nîşankirina dengên derî alfabeyê ya latînî de, ku li jor me behs kiribûn, em ê fikr û tesbîtên xwe der bibirrin.

Xebatên li ser zimanê kurdî ji Maurizio Garzonî vir de dewam dikin. Xweser jî li ser rêzimana kurdî gelek xebat hatine kirin û hinekên wan li ser dengên kurdî û dengsaziya kurdî zêdetir sekinîne. Xebatên ser dengsaziya kurdî yên pêşîn piranî wekî beşek ji rêzimana kurdî hatine kirin. Nimûne; xebata Celadet Bedirxan û Roger Lescot (Bedirxan & Lescot, 2011), xebata Thackston (Thackston, 2006: 1-6) xebata Qanatê Kurdo (Kurdo, 2013) û xebata Sadiq Bahaeddînê Amedî (Amedî, 2012) çend ji van xebatan in ku bi dirêjahî ser dengsaziya kurdî sekinîne. Ji bilî van xebatan, xebatên wekî tez ên ser dengsaziya kurdî van demên dawî êdî zehf tên kirin ku ew pişta xwe didine berhevokan û analîzên xwe li ser wan dikin.

Di zimanekî de hemî deng dikarin bi tîpan neyên nîşankirin lewre hem piranî deng ji tîpan zêdetir in hem jî li gorî zarave û devokên zimên, deng dikarin kêm an zêde bibin. Ji ber wî jî dema deng hatin tesbîtkirin ji bo standardek bê girtin divê li ser nîşankirina dengan lihevkirineke giştî pêk were, yan na ew ê li ber lêkolîneran bibe kêşeyeke mezin. Wekî mînak îro di tirkî de ev kêşe heye ku lêkolîner jê bêzar in û riya standarda alfabeya dengan digerin. Bi tevî dengên alfabeya tirkî, heta niha di devokên Tirkiyê de 133 deng (48 dengdêr, 85 dengdar) hatine tesbît kirin (Demiray, 2008: 203) ku ji van dengan hinek; bi dengekî lê bi çend nîşanan, hinek; bi çend dengan lê bi heman nîşanî hatine nîşankirin (Demiray, 2008: 209).

Ji bo ku xebatên ser dengsaziya kurdî hêj nû ne û teknolojiya nasîna dengan pêş ketiye dema me xebatek li ser dengsaziyê kir divê pêşî corpus/bingeheke me hebe ku em ser bixebitin ku ew jî zêdetir metnên berhevok ên devokan in, paşê ji bo ku em tesbît û tesnîfên rast bikin divê em ji teknolojiyê sûde bigirin. Ev teknolojiya nasîna dengan jî di hin programên kompîtûrê yên wekî; *Nero, Wavesurfer* de hene ku dikare jê bê îstîfadekirin herwiha programa Praat jî heye ku di labaratuwarên fonetîkê de ji bo analîzkirina dengan ji programên din pêşketîtir e (Küçüker, 2016: 1-15).

Lêre, divê em vê jî bêjin ku ji bo em vê teknolojiyê îstifade bikin hin zehmetî li ber me hebûn. A pêşîn; ji bo vî karî divê beşên zimannasiya kurdî yên serbixwe hebin û di zanîngehan de labaratuwarên dengan hebin ku beşên kurdî; digel bi îstifadeya xebatên zimanên din bikarin bi vê teknolojiyê karê dengnasiyê bikin. A duwem; ji hemî deverên her zaravayekê divê berhevok hebin ku lêkolîner bikarin ser bixebitin. Bo nimûne; em niha nizanin çend dengên kurmancî hene yan jî dengên heyî gelo di hemî deveran de hevpar in an na?

Dengsaziya Kurdî

Ji zanista ku li ser çêbûn, guherîn, lêkolîn û şopandina dengan dixebite re dengzanî tê gotin (Öcek, 2014: 21). Dengzanî hemî rewşên dengan ên wekî; guherîn, dariştin, ketin, racivîn, kewyan û wd. lêdikole û şaxeke zimanzaniyê ye.

Dengzanî heke zimanekî tenê ji aliyê dengên wê ve lêbikole wekî dengsazî tê navandin. Dengzanî hemî dengên dinyayê bi tevahî dike mijara xwe, di hemî zimanan de xalên hevpar, rûdan û qanûnan lêdikole (Aksan, 2009: 26).

Îro dengzanî vediqete gelek şaxan ku wekî; "Dengzaniya Gotinî, Dengzaniya Bihîstinî, Dengzaniya Akustîk, Dengzaniya Fizyolojîk, Dengzaniya Azmûnî û Dengzaniya Giştî" (Aksan, c.II., 2009: 11) şaxên wê hene.

Deng, di zanista fizîkê de wekî rûdaneke demborî ye ku bi lerzê ve pêk tê. Dema têlek an jî cismekî ku ji herdu aliyê wî ve hatiye rakişandin bi lêdanekê ve deng derdixe ew deng; tevgera lerizandinê ya di hewayê de ye ku bi pêlên dengan ve tê bihîstin (Aksan, c. II., 2009: 12). Di ziman de jî: "Bayê ku ji pişika mirov derdikeve diçe zengilorê, li vir bizavekê dide ta ango jiyên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, arîkê dêv û difina mirov dirûvekî digire." (Tan, 2011: 36).

Deng/fon wekî bingeha axaftin û ziman e ku dengê pênasekirî wekî *fonem* tê zanîn. Peyva *fonem* ji *phonema* ya grekî tê ku di wateya deng de ye. Ev peyv wekî termeke dengzaniyê di sala 1870an de Jan Baudouin de Courtenay ji cihana zanînê re daye nasandin ku pey wî xwendekarên wî *teoriya fonemê* pêş xistine (Demirci, 2011: 359-366). Bi qasî ku tê zanîn heta niha li gorî IPA(International Phonetic Alphabet/Alfabeya Fonetîk a Navneteweyî) di zimanên cihanê de ji 100î zêdetir fonem hatine tesbîtkirin. Di xebatên dengzaniyê de dema dengek wekî fonem bê pênasekirin, ew di navbera du dabeşan de tê nîşandan, mînak; fonema "a" wekî /a/ ye. Alofon jî şêweyeke cuda ya dengekî di devoka zimanekî de ye ku ew cure deng, cudatiyekê di wateyê de pêk nayne. Ew jî bi kevana rastkoşe tê nîşandan, mînak; alofona "a" wekî [a] ye. Li aliyekî din fonem bi tîp/grafîman tên nîşandan, bi wan morfem bi morfeman jî peyv têne pê.

Dengên Kurdî

Di alfabeya kurdî de wekî tê zanîn 31 tîp hene. Ji van 8 tîp dengdêr û 23 tîp jî dengdar in.

Alfabeya kurdî alfabeyeke ne fonetîk e lewre ji bo her dengekê tîpek nehatiye danîn. Ji bilî 31 tîpên alfabeyê hin deng hene ku di alfabeya erebî de beramberî wan tîp hene lê di alfabeya latînî de tunene. Dîsa hin deng jî hene ku di herdu alfabeyan de jî wekî tîp nehatine nîşankirin. Di alfabeya latînî de dengên bêtîp ên sereke gava ku tên bikaranîn ji girêdana peyvan

û tevayiya hevokê tên fêmkirin. Hin ji van xasî kurdî ne hin jî ji zimanên biyanî ketine nava kurdî.

Ji bo ku em di nivîsandinê de bikaranîna dengên derî alfabeya kurdî ya standart bizanin divê pêşî em li alfabeyên latînî yên pêşîn binêrin bê ka ew deng wekî tîp di wan de hatine bikaranîn an na.

Nîşankirina Dengan di Alfabeyên Latînî-kurmancî de

Wekî ku tê zanîn yekemîn alfabeya latînî ya kurmancî di sala 1928an de ji aliyê Îsahak Marogûlov û Erebê Şemo ve hatiye amadekirin. Salek şûnde wan alfabeya xwe bi guherandina hin karekteran nû kirin. Di alfabeya wan de çendî hin karekterên kirîlî hebin jî alfabeya wan wekî alfabeya pêşîn a latînî-kurmancî tê qebûlikirin ku wan bi vê alfabeyê kitêbeke bi navê; *Xɵ-xɵ hinbuna xɵndьna nvisara kyrmanç*(Xwe-xwe hînbûna xwendina nivîsara kurmancî) weşandine (Xelîl, 2016). Dema em li alfabeya Marogûlov û Şemoyî dinêrin em dibînin ku herçar dengdarên nehilmî û "ġ/ɟ"ya qirikî cî digirin. Dengên alfabeya wan wekî li jêr e:

"a, b, c, ç, d, e, ə, f, g, ғ, h, i, ь, j, k, ĸ, l, m, ɴ, o, ɵ, w, p, n, q, ч, s, ш, ц, t, u, y, v, x, z, ƶ." Paşê wan alfabeya xwe reforme kir û ev şikil dayê:

"A a, Bb, Cc, Çç, Єє, Dd, Ee, Əə, Ff, Gg, Ꞡꞡ, Hh, Ħħ, Ii, Jj, Kk, Ķķ, Ll, Mm, Nn, Oo, Öö, Pp, Ṕṕ, Qq, Rr, Ss, Şş, Tt, Ţţ, Uu, Ûû, Vv, Ww, Xx, Yy, Zz, Ƶƶ, Ьь"

Wekî ku ji alfabeya wan diyar dibe wan herçar dengdarên nehilmî ji rêzê wekî; "Єє, Ķķ, Ṕṕ, Ţţ", tîpa ġ/ɟ wekî "Ꞡꞡ" û tîpa ḥ/ƺ jî wekî "Ħħ" nîşan kirine. Lê ji bo herdu dengên "r"ya lerzok û "l"ya bişid tu tîp nehatine nîşankirin.

Li aliyekî din di Hawarê de Celadet Bedirxan li ser nîşankirin û tesbîtkirina tîpan disekine, behsa herçar dengên nehilmî dike û dibêje hewce nîne ji bo her dengekê tîpek bê danîn. Herwiha ew ji bo dengên " ɛ, ƺ, ɟ" yên ku di alfabeya erebî de hene nîşana duxalê; " ¨ " pêşniyar dike. Bo nimûne; wî ji bo tîpa (ɟ) tîpa **ẍ** û ji bo tîpa (ƺ) jî tîpa **ḧ** bi kar anîye (Bedirxan & Lescot, 2011: 18). Lê paşê wî ew terikandiye û di şiklê dawî ya alfabeya kurdî de cî nedaye van herdu tîpan.

Di alfabeya latînî- kurmancî ya standart de tîpên kurdî yên di kurmancî de wekî deng hene lê di alfabeyê de nehatine nîşankirin ev in:

1. Dengdêrên eynî (ɛ) yên ji dengdêrên "a, e, i, î," çêdibin. Li hin deveran tîpên 'u' û 'o' jî bi dengê eynê ve tên bikaranîn û peyvên bi wan jî tên dîtin. Mînak: " 'orîn, 'urf û ww.
2. Dengdarên ne hilmî yên "ç k, p, t," dengdara "r" ya lerzok, dengdara "l" ya bişid, dengdarên qirikî "ġ"(ɟ) û "ḥ"(ƺ).

Dema em li alfabeya fonetîk a navneteweyî IPA'yê dinêrin em dibînin ku ew alfabe hem dengên tîpên alfabeya latînî dihewînin hem jî dengên ku di alfabeyê de wekî tîp nehatine nîşankirin têde cî digirin. Lê ev alfabe ji bo bikaranîna alfabeya dengan a kurdî vê gavê ne li cî ye. Lewre divê pêşî dengên hemî deverên kurdî bên diyarkirin, li ser alfabeyeke dengan niqaş û xebat bên kirin, heta ji teknolojiyên dengnasiyê bê îstîfadekirin, dûre li ser alfabeyê biryar bê dayîn. Dîsa Kurdish Academy[1] jî alfabeya yekgirtû ya bi hersê alfabeyên kurdî; -erebî, latînî, kîrîlî- diyar kiriye û têde kurmancî-soranî, berawirdkirî, hemî dengên sereke yên kurdî cî digire. Ev alfabe jî bi kêşe ye. Nimûne, dengên nehilmî yên tîpên "p, t, k" wekî; " ph, th, kh" bi kar aniye û "ç"ya nehilmî jî têde cî nagre. Hal ev ku dengên hilmî "p, ç, t, k" dirêj in û gava ji devê mirov dertên mirov bi dengê "h"yê dihese (Tan, 2011: 40).

Di Hin Xebatên Rêzimanî de Nîşankirina Dengan

Di kurdî de ji bo bikaranîna dengên bêtîp danîna nîşanan an jî diyarkirina tîpan kêşeyek e ku hê jî hin nivîskar an jî weşan li gorî xwe van dengan bi tîpan diyar dikin an jî li ser hin tîpan nîşanan zêde dikin û wisa diyar dikin. Bikaranîna dengên bêtîp de; dengdêr, piranî bi nîşaneya " ʻ ", dengdar jî; bi duxal, dabir, xêz an jî nîşaneyeke din hatiye kirin. Di berhema xwe ya Rêzimana Kurdî de Qanatê Kurdo di derbarê mijarê de hin agahiyan dide û bixwe jî ji bo dengên bêtîp nîşanên wekî " ʻ " û " ʼ " bi kar tîne (Kurdo, 2013: 43-46).

Dîsa ji bo dengên nehilmî yên "p, ç, t, k" û "l"ya bişid û "r"ya stûr jî gelek niqaş hatine kirin û di weşanên cuda cuda de li ser van dengan nîşane hatine danîn. Wekî mînak di Kovara Hêvî de ev mijar ji bo "p, ç, t, k" û dengên "r"ya stûr û "l"ya bişid nîqaş hatiye kirin (Hêvî, 1983: 10-16). Di heman berhemê de dengên "p, ç, t, k" bi nîşana " ʼ "wekî "pʼ, çʼ, tʼ, kʼ " tên nîşankirin û ji bo "r"ya stûr jî tu nîşan nehatiye danîn. Dîsa di berhema navborî de wekî biryar, sedema bikarneanîna pênc dengdarên navborî[2] yek bi yek tên diyarkirin. Li aliyekî din Qanatê Kurdo di berhema xwe ya Rêzimana Kurdî de berevajî nîşankirina Kovara Hêvî dike; "p, ç, t, k" wekî yên nehilmî û "pʼ, çʼ, tʼ, kʼ " jî wekî yên hilmî diyar dike (Kurdo, 2013: 39).

Ji bilî van çend mînakên navborî, xebatên din jî hene ku tevî nîqaşên ser dengsazî û tîpsaziya kurdî bûne. Di xebata xwe ya ser Devoka Filistanê[3] de me jî di nîşankirina hinek dengan de da ser şopa pêşiyan, di hinekan de jî tesbît û nîşankirina xwe da pêş. Û dengên ku di alfabeyê de nînin me wiha nîşan kirin (Açar, 2015):

[1] Malpereke înternetê ye û lêkolînên zanistî yên ser ziman û xweser jî ser kurdî dihewîne.
[2] Di kovarê de wekî biryar, "l"ya bişid wekî dengekî hevpar ê kurmancî û soranî nayê dîtin.
[3] Ev xebat wekî tez li ser dengsaziya devokeke kurmanciya bakur hat kirin ku di sala 2015an de li Zanîngeha Bîngolê di Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de hat pejirandin. **Filistan**: Ji Bakurê Kurdistanê devereke ku; dikeve navbera riya Elcewaz (navçeya Bilîsê) - Erdîşê (navçeya Wanê) û Gola Wanê.

Dengdêrên bi dengê eynê(ع) çêdibin me dabir " ʿ " dan rexê wan ê çepê. Dengê "e"ya bieyn jî, ya wekî cotdengdêr jî me dabir " ʾ " da rexê wê yê rastê. Dengdarên ku di alfabeyê de tunene jî me wiha nîşan kirin: "*Ç* ya nehilmî wekî **ç̇**, *p* ya nehilmî wekî **p̊**, *k* ya nehilmî wekî **ḱ**, *t* ya nehilmî wekî **ṯ**, dengdara (غ) wekî **ġ** û dengdara (ح) jî wekî **ḥ**" me nîşan kirin. Dîsa me *r* ya stûr wekî **ṙ** nîşan kir û ji bo ku li deverê *l* ya bişid gelekî kêm tê dîtin me jêre tu nîşan daneynîn lê dema ciyên derbas dibûn me ew cot bi kar anîn û bi wî awayî me dengên xwe diyar kirin.

Ji bilî van dengên ku me li jor behs kirin li deverê bi qasî ku me tesbît kir dengê *n* ya stûr jî heye ku dengdareke pêşarîkî û difnî ye. Me ev deng jî wekî **ṅ** di metnên xwe de diyar kir.

a. Dengdêr

Dengên ku gava derdikevin rastî tu astengiyê nayên û bi serê xwe xwedî dengekê ne wekî dengdêr tên navandin. Di alfabeya kurmancî de 8 dengdêr hene. Ji van "a, ê, î, o, û" yên dirêj "e, i, u" jî yên kurt in. Herwiha ji dengdêran "a, e" nizm "i, î, ê, o, u, û" jî dengdêrên bilind in. Em dengdêrên kurdî lî gorî cîderkên wan dikarin wiha nîşan bikin:

1. Dengdêrên pêşderkî : î, e, ê
2. Dengdêrên navderkî : i, u
3. Dengdêrên paşderkî : a, o, u

Li gorî vebûna dêv:

1. Nivgirtî : î, î, ê, o, u, û
2. Vekirî : a, e,

Li gorî şiklê lêvan:

1. Rast : a, e, ê, i, î
2. Gilover : o, u, û

Em dikarin van dengdaran li gorî taybetiyên navborî wiha li ser tabloyê nîşan bidin:

DENGDÊR		**LI GORÎ CÎDERKÊ DENGDÊR**					
		Dengdêrên Pêşderkî		**Dengdêrên Navderkî**		**Dengdêrên Paşderkî**	
Li Gorî Vebûna Dêv		Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî
Li Gor Şiklê Lêvan	Rast	î, ê	e	i			a
	Gilover			u		o, û	

1. Dengdêrên Kurmancî yên Standart

Li vir divê em vê jî bêjin; dengdêrên eynî “ ‘a, ‘e, e’, ‘i,‘î, ‘u” paşderkî ne û ji van “ ‘i,‘î, ‘u ” nîvgirtî, “ ‘a, ‘e, e’ ” jî vekirî ne.

b. Dengdar

Dengên bi alîkariya dengdêran dertên û bi serê xwe bilêvkirina wan zor in, wekî dengdar tên zanîn. Di kurmanciya standart de 23 dengdar hene. Em wan li gorî cîderkên wan dikarin wiha nîşan bikin:

1. Dengdarên lêvkî : b, p, m, w
2. Dengdarên diranlêvkî : f, v
3. Dengdarên diranî : s, z, d, t, n
4. Dengdarên pêşarîkî : ş, j, c, ç, r, l, y
5. Dengdarên arîkî û qirikî : g, k
6. Dengdarên qirikî : q, x, h,

Dîsa li gorî şêweyê derketina wan, em wan dikarin wiha nîşan bidin:

b : cotlêvkî, girtiya nerm
c : pêşderkî, girtiya nerm
ç : hilmî, girtiya hişk
d : girtiya nerm
f : fîzeka hişk
g : girtiya nerm
h : paşderkî, nîvdengdêr
j : fîzeka nerm
k : hilmî, girtiya hişk
l : rexkî
m : cotlêvkî, difnî
n : pêşderkî, difnî
p : hilmî, girtiya hişk
q : girtiya hişk
r : lerzokî
s : pêşderkî, fîzeka hişk
ş : fîzeka hişk
t : hilmî, girtiya hişk
v : fîzeka nerm
w : nîvdengdêr

MUNZUR ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ TUNCELİ 31 MAYIS 2020

x : domdara hişk

y : pêşderkî, nîvdengdêr

z : fîzeka nerm

Niha jî em van dengan li ser tabloyê li gorî cîderkên wan û şêweya derketina wan nîşan bidin:

DENGDAR		LI GORÎ CÎDERKÊ DENGDAR					
		Lêvkî	Diranlêvkî	Diranî	Pêşarîkî	Arîkî, qirikî	Qirikî
LI GORÎ ŞÊWEYÊ DERKETINÊ DENGDAR	Fîzeka hişk		f	s	ş		
	Fîzeka nerm		v	z	j		q
	Lerzokî				r		
	Girtiya nerm	b		d	c	g	
	Girtiya hişk	p			ç	k	
	Rexkî				l		
	Difinî	m		n			
	Domdara hişk						x
	Nîvdengdêr	w			y		h

2. Dengdarên Kurmancî yên Standart

Ji bilî van dengan; dengên “p, ç, t, k” hem ji aliyê şêweyê derketinê hem jî ji aliyê cîderkê ve wekî yên hilmî ne, dîsa “r”ya lerzok wekî ya normal û “l”ya bişid jî wekî ya normal e. Li aliyekî din dengdara ḥ/ح” fîzeka nerm e û qirikî ye, ġ/غ jî girtiya nerm û qirikî ye.

ENCAM

Deng di zimanekî de, piranî, ji tîpên alfabeya wî zimanî zêdetir in. Dema alfabeyek tê çêkirin mebest ew e ku ew alfabe fonetîk be, hemî dengan têde temsîl bike. Lê ev piranî ne mimkun e. Çi alfabeya erebî be çi ya latinî be dema kurdan alfabeyên xwe çêkirine bi kêşeya nîşankirina dengan re rû bi rû mane ku ev kêşe hê jî dewam dike.

Ji xebatên li dor alfabeyên pêşîn heta xebatên van salên dawîn dengên kurdî û nîşankirina wan her nîqaş li ser hatiye kirin. Îro lihevkirinek li ser dengên standart ên alfabeya latînî hebe jî di nîşankirina dengên derî alfabeyê de wekî ku jorê em ser sekinîn lihevkirinek tuneye.

Dengên kurmancî li gorî alfabeyên ku em bi kar tînin ji tîpan zêdetir in û di alfabeyên kurmancî yên standart de hemî deng cî nagirin. Alfabeya kurmancî ya latînî bi 8 dengdêr û 23 dengdaran tevayî 31 tîp e û heşt dengdarên kurmancî("ç, k, p, t,", "ḥ/ƺ"ya qirikî, "ġ/ɣ"ya qirikî, "r"ya lerzok û "l"ya bişid) û dengdêrên eynî(ɛ) yên ku li ser niqaş hatine/tên kirin nahewîne. Ji van dengan dengdêrên eynî piranî ji bêjeyên esilerebî ne. "ḥ û ġ" yên qirikî jî em dikarin bêjin ku ji tesîra zimanên biyanî ya li ser kurdî ketine zimanê me. Her çiqas bêjeyên kurdî yên bi "ḥ" hebin jî ew ji ber tesîra guherîna dengan pevguherîna "h>ḥ"yê ye ku di teza me de mînakên wê hene. Mînak: "her gav> ḥergav, her ro> ḥero û ww."

Dengdarên "ç, k, p, t,"yên nehilmî di kurmancî de berbelav in. Heçî "r"ya lerzok û "l"ya bişid in di soranî de zêdetir tên bikaranîn lê di kurmancî de jî hene û "l"ya bişid çendî kêm be jî "r"ya lerzok berbelav e.

Ji bilî van heşt dengan dengine din jî hene ku ji wan hinek hatine tesbîtkirin ku mimkun e hin dengên din jî hebin. Ji bo ku em hemî dengên derî alfabeyê yên hevpar û dengên devokî binasin û lêkolîner jê îstifade bikin em dikarin van xalên jêrîn pêşniyar bikin:

1. Divê em giringiyê bidin ser xebatên qadê û ji devokan berhevokan qeyd bikin.
2. Divê em ji teknolojiya dengnasiyê îstifade bikin û ji kesên/saziyên di vî warî de xwedî tecrube ne sûd bigirin.
3. Piştî ku me qeyd deşîfre kirin divê em dengên derî alfabeyê nîşan bikin û li ser tîpandina wan alfabeyeke standart a dengan çêkin.
4. Bi van dengan; peyvên ku me berhev kirin em dikarin ferhengeke devokan jî amade bikin.
5. Bi xêra lêkolînên qadê û berhevokan em dikarin atlaseke devokên kurdî çêkin.

Ev pêşniyar dikarin bên dirêjkirin lê divê em vê jî bêjin; ev xebata hanê divê wekî xebateke komî bê kirin. Beşeke kurdî yan jî heke bibe zanîngeh an jî fakulteyeke kurdî dikare vî karî baştir bike. Yan jî beşên kurdî dikarin vê xebatê wekî projeyekê jî organîze bikin. Herwiha ji bo niqaş û şêwrê komxebat an jî kongre jî dikarin bê li dar xistin.

Wekî gotina dawî divê em vê bêjin ku, eger ji bo nîşankirina dengan em li ser standardekê li hev nekin herkes dê li gorî xwe dengan nîşan bike û dê karê lêkolînerên dû xwe dijwar bike.

JÊDER

Açar, Zafer (2015), *Devoka Devera Filistanê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Bîngol.

Aksan, Doğan (2009), *Her Yönüyle Dil-Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. I-II-III. Ankara: Türk Dil Kurumu.

Amedî, Sadiq Bahaeddîn (2012), *Rêzimana Kurdî, Kurmanciya Jêrî û Jorî ya Hevberkirî*. Stenbol: Dîwan.

Aydoğan, İbrahim Seydo (2013), *Guman-1*, Stenbol: Lîs.

Badıllı, Kemal, "Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)", Ankara Basım ve Ciltevi, http://mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com.tr/p/pirtuken-pdf.html, di 10 Hezîran 2015an de pêwendî hat kirin.

Baran, Bahoz (2012), *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol: Belkî.

Bedirxan, Celadet Alî (2010), *Bingehên Gramera Kurdmancî*, Stenbol: Avesta.

Bedirxan, Celadet & Lescot, Roger (2011), *Kürtçe Dililgisi (Kurmanci)*, ç. 5. Stenbol: Doz.

Demiray, Erdinç (2008), Ağız Araştırmalarında Transkripsiyon İşaretlerinin Kullanılması Sorunu. Turkish Studies, www.turkishstudies.net/DergiArama, di 14 Hezîran 2015an de pêwendî hat kirin.

Demirci, Kerim (2011), *Fonem Teorisinin Önemi Hakkında*, Turkish Studies, www. turkishstudies.net/DergiPdf Detay. Di 16 Hezîran 2015an de pêwendî hat kirin.

Hawar, Elfabêya Kurdî, hejmar 1- pdf, www.candname.hawarnet.org/.../hemu-hejmaren-kovara-hawar-b..., 20 Hezîran 2016an de pêwendî hat kirin.

http://candname.hawarnet.net/2012/05/em-zimane-kurdi-binasin.html, di 03 Hezîran 2015an de pêwendî hat kirin.

https://en.wikipedia.org/wiki/Kurdish_alphabets#cite_note-14, Di 25 Hezîran 2016an de pêwendî hat kirin.

http://www.kurdishacademy.org/?q=node/454, "Kurmanci Kurdish, A Reference Grammar with Selected Readings". Di 10 Gulan 2015an de pêwendî hat kirin.

https://ku.wikipedia.org/wiki/Alfabeya_%C5%9Eemo-Marog%C3%BBlov

Kovara Hêvî. (1983) "Ziman" . www.worldcat.org/title/**hevi-kovara**-candiya..., Di 10 Hezîran 2015an de pêwendî hat kirin.

Kurmancî, (2009) (Hejmar 1-40, havîn 1987-bihar 2007) Rojnameya Enstîtuya Kurdî ya Parisê. Stenbol: Avesta.

Kurdo, Qanatê. (2013). Rêzimana Kurdî, Stenbol: Nûbihar.

Mahmoud, Barzo Omar (2016), Şîrovekirineke *Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, Teza Mastirê ya Zanîngeha Artukulu, Mêrdîn.

Ocek, Nezîr (2014), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Wan: Sîtav.

Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, "Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects", http://www.kurdishstudies.net/407-983-2-PB-pdf, Di 04 Sibat 2015an de pêwendî hat kirin.

Küçüker, Paki, "Fonetik Çalışmalar Ve Ağız Araştırmalarında Bilgisayar Ve Ses Programlarının Kullanımı" pdf.sakarya.edu.tr/ paki _ küçüker, _ vı.uluslar arası _ türk _ dil _ kurultayı__**fo**...,12 Hezîran 2016an de pêwendî hat kirin.

Rashid Ahmad, Abdul-Majeed (1986), *The Phonemic System of Modern Standart Kurdish*, The University of Michigan.

Shojai, Behrooz (2000), *The Kurdish of Gilan*, Uppsala University Department of Asian and African Languages, Uppsala.

Tan, Samî (2011), *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî.

Xelîl, Têmûrê (2016), http://diyarname.com/news.php?Idx=21186, di 20 Hezîran 2016an de pêwendî hat kirin.

Zaid Mahmoud, Lanja (1994), *Kurdish Personal Affixes*, The University of Texas.

Zêrevan, Arif (1997), *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*. Stockholm: Nefel.

MUNZUR 2. ULUSLARARASI SOSYAL BİLİMLER KONGRESİ
TUNCELİ
31 MAYIS 2020

FÜZULİNİN "LEYLİ VƏ MƏCNUN" POEMASINDA İŞLƏNMİŞ ANTROPONİM VƏ TOPONİMLƏR

Öğretim ve Arş. Gör. Aynurə ƏLİYEVA
Azərbaycan Dövlət Pedaqoji Universiteti

ÖZET

Azərbaycan-türk şeirinin görkəmli nümayəndəsi Məhəmməd Füzuli Şərq xalqlarının ədəbiyyatına güclü təsir göstərən dahi bir sənətkardır. Xaqani, Nizami, Rumi, Nəsimi, Yunis Əmrə, Nəvai kimi ölməz şairlər arasında layiqli yer tutan Füzulinin şeirimizdə yeri çox yüksəkdir.Yaxın və Orta Şərq ölkələrinin heç birində Füzulidən sonra onun səviyyəsində şair yetişməmişdir.

Şairə ən çox şöhrət qazandıran əsərləri ana dilində yazdığı qəzəlləri və "Leyli və Məcnun" poemasıdır. Dahi şairimizin bu poeması bədii dəyərinə görə qiymətsizdir. Əsərin dilindəki xüsusi sözlərin araşdırılması poemanın oxucular tərəfindən daha yaxşı anlaşılması və klassiklərimizin əsərlərinin dilinin öyrənilməsi baxımından aktualdır.

M.Füzulinin "Leyli və Məcnun" əsəri onomastik vahidlərlə zəngindir. Məsələn:

Nə Hind, nə Fars, nə Xorasan,
Nə Rumü Əcəm, nə Şamü Şirvan.

(3. səh.30);

Şad etmiş idi Əbunüvası
Haruni-xəlifənin ətası.

(3. səh.32);

Olmuşdu Nəvayi-süxəndan
Mənzuri-şəhənşəhi-Xorasan.

(3. səh.32);

Əbr istehsanü bərq kinə,
Şahənşəhi -Məkkəvü Mədinə. (3. səh.35).

Göründüyü kimi şair nümunə göstərdiyimiz birinci beytində yeddi, digər beytlərində isə iki onomastik vahid işlətmişdir. Bu misalların sayını istənilən qədər artırmaq mümkündür.

M.Füzulinin "Leyli və Məcnun" poemasında işlənmiş onomastik vahidləri aşağıdakı kimi qruplaşdırmaq olar:

1. Antroponimlər. Məs.; Leyli, Məcnun, İsa, Nizami, Sultan Süleyman, Xızr, Zeyd, Nofəl və sair;

2.Toponimlər. Məs.; Bağdad, Bəsrə, Məkkə, Mədinə, Xorasan, Kəbə və sair;

3. Etnonimlər: Məs.; türk, ərəb, fars və sair;

4. Fitonomlər: Məs.; nərgiz, lalə, reyhan, zənbəq, xaşxaş və sair;

5. Kosmonimlər: Məs.; Bəhram, Ütarid, Zöhrə, Mərrix, Ay və sair;

6. Zoonimlər: Məs.; Aslan, qaplan, bülbül və sair

Poemada işlənmiş antroponimlər içərisində tarixi şəxsiyyət adları, dini və əfsanəvi adlara təsadüf edilir:

Müzəffər daima Sultan Süleyman xani adildir
Ki, hər kim tabeyi-fərmanı olmaz-namüsəlmandır.

(3. səh. 36);

Xəlqə verib intizari-məqdəm,
Ol dəm gəldi ki, gəldi Adəm.

(3. səh. 24);

İqbalın olub qərini-xurşid,
Ögrətdi Məsihə rəsmi-təcrid.

(3. səh. 25);

Carubi-gərdi-rəhgüzərin bali-Cəbrəil
Taqi-rəvəqü dərgəhin eyvani-kibriya.

(3. səh. 28)

"Leyli və Məcnun" əsərində işlənmiş bəzi antroponimlər haqqında məlumat verək:

Adəm. Ərəb mənşəli söz olan "adəm"-insan deməkdir. İlk insan və ilk peyğəmbər Adəmin adı ilə bağlıdır. (1. səh.12) Rəvayətə görə Allah hər cins torpaqdan bir az qarışdıraraq Adəmi yaratmış və sonra onun böyründən Həvvanı çıxarmışdır. Cənnətdə yaşayan Adəm və Həvvaya buğda yemək qadağan edilmişdir. Bir gün şeytan onları aldatmış və buğda yemişlər, buna görə də cənnətdən qovulmuşlar.

Onlar insanlığın yer üzündə ilk nümayəndələridir.

Məhəmməd Füzulinin "Leyli və Məcnun" əsərində də Adəm antroponimi məhz peygəmbər adı kimi işlənmişdir:

Xəlqə verib intizari-məqdəm
Ol dəm gəldi ki, gəldi Adəm.

(3. səh. 24).

Cəbrəil. Poemada rast gəlinən adlardan biri də Cəbrəildir:

Carubi-gərdi-rəhgüzərin bali-Cəbrəil,

Taqi-rəvadü dərgahin eyvani-kibriya

(3. səh. 28)

Cəbrail dini addır. Dini kitablara görə, Allahın dörd yaxın mələyi vardır: Cəbrail-Allahın sözlərini peyğəmbərlərə yetirən; Mikayıl-Allahın bəndələrinə ruzi paylayan; İsrafil-qiyamət günü sur-şeypur çalıb ölüləri qəbirdən qaldıran; Əzrail -insanların canını alan, buna Məlakül-mövt də deyilir.

Cəbrail adının tərcüməsini ərəb dilində axtarmaq düz olmaz, çünki İslam hadisələrinə o, Tövrat əfsanələrindən düşüb. Burada onun adı Qavraiildir. Professor Lev Uspenski onu "allahın döyüşçüsü", fransız publisisti Leo Taksil isə "allahın adamı" kimi tərcümə edir.

Deməli, Cəbrayıl (Cəbrəil) qədim Yəhudi "Qavriil" adının ərəb forması olub "allahın əsgəri, tanrının döyüşçüsü" anlamini bildirir.

Qeys. Poemada əfsanəvi aşiq Məcnunun əsl adıdır:

Kim, Qeys ikən, oldu adı Məcnun,
Əhvalını etdi qəm digərgun.

(3. səh. 65)

Ərəb sözü olan "qeys" -ölçü, miqdar deməkdir. Şəxs adı kimi "həddən artıq, ölçüsündən çıxmış" mənasını ifadə edir (1. səh.178). Müasir dövrümüzdə Qeys adından çox az istifadə olunur.

Leyli. Poemanın əsas qəhrəmanlarından birinin adıdır:

Aləm səri-muyinin tufeyli,
Məhbubeyi-aləm, adı Leyli.

(3. səh.50);

Hər kim sorar olsa Qeysə bir raz,
Leylidən ona yetərdi avaz.

(3. səh.51) və s.

"Leyli və Məcnun" dastanını ilk qələmə alan Nizami və ondan sonra Füzuli qəhrəmanı Leyli adının ərəbcə yazılışı elədir ki, onu həm də Leyla kimi oxumaq olur. Adın mənası "gecəyə məxsus, qaranlıq; qara saçlı" deməkdir. Bu adın qədim yəhudicə "liliya" (xoş iyli, zərif gül) sözü ilə eyni kökdən olduğu da güman edilir. (1. səh.189)

Nizami və Füzuli qəhrəmanının adı məişətimizdə Leyla şəklində daha çox işlənir. Bu da onu göstərir ki, Nizaminin və Füzulinin poemalarından xeyli əvvəl ad məişətimizə Leyla şəklində daxil olub, nəsildən-nəslə keçib. Sonradan gələn Leyli adı Leylanı sıxışdırıb aradan çıxara bilməyib.

Məcnun. Ərəbcə "məcnun"-dəli, divanə; məcazi mənada eşqə tutulmuş, vurgun deməkdir. (1. səh.196) "Leyli və Məcnun" poemasında Qeysə bu ad Leylinin eşqindən məcnunluq səviyyəsinə çatdıqdan sonra xalq tərəfindən verilmişdir.

Mustəfa. Poemada rast gəldiyimiz adlardan biri də Mustəfadır:

Ya Mustəfa, Füzuliyi-möhtacə rəhm edüb,
İzhari-iltifat ilə qıl hacətin rəva.

(3. səh. 29)

Ərəbcə "mustəfa"-seçmə, seçilmiş, bəyənilmiş deməkdir. İmam Əliyə verilmiş adlardan biridir. (1. səh. 219) Bu ada "Dədə Qorqud" dastaninda da rast gəlinir. Lakin dastandakı Mustəfa süjetlə əlaqəli surət deyil. Bu ad yalnız boyların sonunda Məhəmməd adının sinonimi kimi çəkilir:

Yığışdırsun, duruşdursun, günahlarını
Adı görklü Məhəmməd Mustafa yüzi suyuna
Bağışlasın, xanım, hey!...

(3. səh. 51).

Bu xeyir dua, şübhəsiz ki, qədim dastanın sonralar üzünü köçürən katibin əlavəsidir. Belə ki, "Kitabi-Dədə Qorqud"dakı hadisələrin baş verdiyi vaxtlarda onun qəhrəmanları Məhəmmədi, Mustafanı hələ tanımırdılar.

Füzuli poemasındakı Mustəfa da dini ad kimi işlənmişdir.

Zeynəb. Füzuli poemasında antroponiminə də rast gəlirik:

Olmuşdur əsir bir nigarə,
`Büt ziybli Zeynəb adlı yarə.

(3. səh. 142)

Ərəbcə "zeynəb" – kök, dolğun; gözəl, yaraşıqlı, bəzənmiş deməkdir. Zeynəb Məhəmməd peygəmbərin (s.a.s.) sevimli qızının, həmçinin əziz arvadlarından birinin adı olmuşdur. (1. səh. 347) Bu ad şərq aləmində geniş yayılıb. Ona Ərəbistandan başqa İranda, Türkiyədə, Əfqanıstanda da çox rast gəlmək olar.

Azərbaycan xalqının məişətində Zeynəb adından bu gün də geniş şəkildə istifadə edilir.

Nəvai. Poemada Nəvai adı ilə də rastlaşırıq:

Olmuşdur Nəvaiyi-süxəndan
Mənzuri-şəhənşəhi-Xorasan.

(3. səh. 32)

Füzuli burada özbək şairi Əlişir Nəvaini nəzərdə tutur. Dahi özbək şairi və mütəfəkkiri Əlişir Nəvai (1441-1501) bir müddət Sultan Hüseyn Bayqaranın vəziri olmuşdur. Nəvai öz

qiymətli və zəngin kitabxanasını xalqın istifadəsinə vermiş və bir sıra məktəblər təsis etmişdir. Onun özbək dilində "Xəmsə"si, dörd divanı və başqa əsərləri vardır. Ədəbi yaradıcılıqda Nizami ədəbi məktəbinə mənsub olmuşdur.

Farsca "nəva+i"-avazlı, səsli, muğama məxsus, nəğməyə məxsus; varlı, sərvətli deməkdir. (1. səh. 235)

Nizami. Füzuli "Leyli və Məcnun" əsərində dahi Nizami Gəncəvini ehtiramla yad edir:

Bulmuşdu səfayi-dil Nizami,
Şirvanşəhə düşüb girami.

(3. səh., 32)

Nizami təxəllüs kimi XII əsr Azərbaycan şairi və mütəfəkkiri İlyas Yusif oğlu Gəncəviyə aiddir. Sonradan sənətkarımıza olan ehtiram və hörmət bu təxəllüsün şəxs adı kimi məişətimizdə geniş yayılmasına səbəb olmuşdur.

Ərəbcə "nizam+i"-nizamlı, qayda-qanunlu; qayda-qanun yaradan, nizama salan deməkdir. (1.səh., 238) Nizami təxəllüsü həm də, "şeir, poeziya" bildirən "nəzm" ilə eyni kökdəndir. Dahi Nizami Gəncəvi də şeir mülkünün sultanı, hökmranı, qayda qoyanı idi. Bu gün də söz sultanı Nizami Gəncəvi bütün dünyada məşhurdur.

Bu adlardan başqa "Leyli və Məcnun" poemasında Məsih, İsa, Füzuli, Nəmrud, Xəlil, Əbunüva, Harun, Musi, Ali, Osman, Sultan Süleyman, Əhməd, Veys, Səlman, Zeyd, İbni Səlam, Xızır və s. antroponimlər də işlənmişdir.

Poemada işlənmiş bəzi yer adlarının semantikası haqqında məlumat verək:

"Leyli və Məcnun" poemasında rast gəlinən adlardan biri də **Bağdaddır:**

Ancaq deməzəm ki, xaki-Bağdad
Alayişi-nəzmdəndir azad.

(3. səh. 30)

Bağdad Ərəb İraqının ən böyük şəhərlərindəndir. Hazırda İraq Ərəb Respublikasının paytaxtıdır. Dəclə çayının sahilində yerləşir. Mühüm dəmir yol, şosse yo-lu və çay nəqliyyatı mərkəzidir. Şəhərin əsası xəlifə Mənsur tərəfindən 762-ci ildə qoyulmuş və Abbasilər xəlifələrinin paytaxtına çevrilmişdir. Orta əsrlər Şərqinin ən böyük siyasi, iqtisadi və mədəni mərkəzi olmuşdur.

Bağdad sözünün lüğəti mənası – "Allahın hədiyyəsi", "Allah tərəfindən verilmiş" deməkdir.

Xorasan. Poemada rast gəlinən coğrafi adlardan biri də Xorasandır. Xorasan orta əsrlərə qədər Orta Asiyanın ən böyük ölkələrindən biri olmuşdur. Iranın şimal-şərqində bir vilayətdir;

imamlardan Əli Rzanın qəbri bu vilayətin mərkəzi olan Məşhəd şəhərində olduğundan, bura müsəlmanların ziyarətgahıdır.

Qədim İran dövlətləri, yəni Pişdadyan və Kəyamyan zamanında əsl İran, Xorasan və onun ətrafından ibarət olmuş və Bəlx şəhəri İranın paytaxtı imiş. Xorasan adı bu ölkəyə sonralar, Sasanilər zamanında verilmişdir. Mənası qədim fars dilində (pəhləvi dilində) "Günəş Yurdu", yəni Şərq deməkdir.

Məkkə. "Leyli və Məcnun" əsərində Məkkə və Mədinə toponimləri də işlənmişdir:

Əbr istehsalü bərq kinə,
Şahənşəhi – Məkkəvü Mədinə.

(3. səh. 34)

Məkkə - Səudiyyə Ərəbistanında şəhərdir. Hicaz əyalətinin inzibati və ticarət mərkəzidir. Ərəbistan yarımadasında ən qədim şəhərlərdən biridir. Müsəlmanların baş ruhani mərkəzi və ziyarət ocağıdır. Buraya hər il minlərlə insan ziyarətə gəlir. Toponimin mənası ərəb dilində "şəhərlər anası" deməkdir.

Mədinə. Səudiyyə Ərəbistanında qədim şəhərlərdən biridir. Lüğəti mənası şəhər deməkdir. Əvvəlki adı Yəsribdir. Məhəmməd (s.a.s.) peygəmbərin qəbri oradadır.

Poemada **Bəsrə** toponiminə də rast gəlirik:

Əmrinə ərəb mütiü münqad,
Cəh Bəsrə məqamı, gah Bağdad.

(3.səh. 44)

Bəsrə-İraq Ərəb Respublikasının cənub-şərqində, Şəttəl-ərəb çayının sahilində yerləşir. Ölkənin ən böyük dəniz limanıdır. Əsası 637-638-ci illərdə xəlifə Ömər tərəfindən qoyulmuşdur. Açıq rəngli daşlardan tikilmiş bu şəhər uzaqdan ağardığı üçün ərəb dilində ağ mənasında olan Bəsrə adını almışdır.

Poemada rast gəldiyimiz **Rum** coğrafi adı bir neçə dəfə işlənmişdir:

Bir neçə zərifi-xütteyi-Rum,
Rumi ki, dedin, qəziyyə mə'lum.

(3. səh. 39)

Rum-Roma şəhəri ilə romalıların adından alınmış və onların Şərq qohumları tərəfindən əvvəl romalılara, onların dövlətinə, sonra bu dövlət Qərb və Şərq dövlətlərinə bölündükdə Rum adı Şərq dövlətinə verilmişdir. Şərq imperatorlarının hakim qohumu olan romalılar yunanlara və onların hökmündə olan başqa qohumlarla birləşib qədim yunan dilində əmələ gəlmiş bir dildə danışmağa başladığından Rum adı bu ümumi qohuma və dilə verilmişdir. Tarixi şəxsiyyət olan İsgəndərə bəzən İsgəndər Rumi deyilməsi də bununla əlaqədardır. Eyni zamanda Şərqi

Rum impe-ratorluğunun hakimiyyəti altında olan ölkələr də bu adla adlanır. Indiki Türkiyə dövlətinin Kiçik Asiya yarımadasında yerləşən ərazisinin Cənub hissəsi olan Anadolu tərəfləri də vaxtilə Rum adlanırdı.

"Leyli və Məcnun" poemasında **Şam** coğrafi adına da rast gəlinir:

Tərpəndi səri-sinani-Bəhram,
Fəth oldu ona vilayəti-Şam.

(3.səh. 169)

Şam – vaxtilə Suriya və Fələstinin tutduğu əraziyə ərəblərin verdiyi ad olmuşdur. Sonralar Şam adı şəhər adı kimi qalmış və nəhayət, həmin şəhər Dəməşq adlandırılmışdır. Hazırda Suriya Ərəb Respublikasının paytaxtıdır. Dünyanın ən qədim şəhərlərindən biri hesab olunur.Onun adına eramızdan əvvəl XV əsrdə təsadüf olunur. Sonralar müxtəlif illərdə müxtəlif hökmdarların paytaxtı və ya əyalət şəhəri olaraq inkişaf etmişdir. Hazırda yaxın Şərqin ən gözəl şəhərlərindən biridir.

Poemada rast gəlinən coğrafi adlardan biri də **İran**dır:

Cahangiri ki, güntək mülk təsxirinə əzm etsə,
Mühəqqər cilvəgahi ərseyi-İranü Turandır.

(3.səh. 37)

İran-Asiyada dövlətdir. İran adı qədim fars dilindəki arxiya sözünün dəyişdirilmiş forması olub, nəsil, əsil-nəcabətli deməkdir. Arxiya adı ilk zamanlar yüksək təbəqəyə verilmiş sonralar bütün ölkəyə şamil edilmişdir.

Əsərin dilində **İraq** toponiminə də rast gəlinir:

Min zərrin nə'l, əsbi-tazi,
Misrivü İraqiyü Hicazi.

(3.səh. 134).

İraq-İran ilə Ərəbistan və Bəsrə körfəzi arasında yerləşir. Qədimdə bu ad Ba-bilistana və ya Mesopotamiyaya məxsus ikən, sonralar bu ad İranın bir hissəsinə də deyildiyindən bunları qarışdırmamaq üçün birincisinə İraqi-Ərəb, ikincisinə İraqi-Əcəm adı verilmişdir. Hazırda İraq-Ərəb Respublikası adlanır. Paytaxtı Bağdad şəhəridir.

Bunlardan əlavə poemada Hicaz, Qaf, Şirvan, Turan, Kəbə və s. toponimlər; ərəb, fars, türk və s. etnonimlər də vardır.

Nəticə olaraq qeyd etmək lazımdır ki, Məhəmməd Füzulinin "Leyli və Məcnun" əsərinin onomastik leksikasını antroponimlər, toponimlər, etnonimlər, fitonimlər, kosmonimlər və zoonimlər təşkil edir. Poemada qədim antroponim, toponim və etnonimlərin işlənməsi bədii əsərin tarixiliyini daha da artırır. Məhəmməd Füzuli kosmonim, zoonim və fitonimlərdən

müxtəlif məqamlarda istifadə etmişdir. “Leyli və Məcnun” əsərində bu leksik vahidlərdən bənzətmə, təşbeh, metofora və s. məqsədlə istifadə edilmişdir. Axtarış və araşdırmalar göstərir ki, Füzuli yaradıcılığı onomastik vahidlərlə zəngindir. Ona görə də Füzuli yaradıcılığında xüsusi adların üslubi imkanları ayrıca bir tədqiqatın mövzusu olmalıdır.

ƏDƏBİYYAT SİYAHISI

1. Azərbaycan dilinin böyük izahlı onomastik lüğəti, I hissə, Bakı, 2007.
2. Kitabi – Dədə Qorqud. Bakı, 1988.
3. M.Füzuli. Əsərləri. 6 cilddə, ikinci cild. Bakı, 2005.

Aliyeva Aynure

Summary

Onomastic units in Fuzuli’s creation (for the materials of the poema of “Leyli and Majnun”)

The poem of “Leili and Majnun” by Mahammad Fuzuli is rich for onomastic units. The using of toponym and etnonym increases the historical redity of artistic work in the poem. It is known that Fuzuli had used fromkosmonym, zoonym and phytonyms in different ways all of them had completed in this article and the ethymological explanation of some onomastic units had been explained.

Key words: antroponym, toponym, etnonym, kosmonym, phytonym.

Айнура Алиева.

Резюме

Ономастические единицы в творчестве М.Фузули (на основе материалов поемы «Лейли и Меджнун»).

Поема Магамеда Фузули «Лейли и Меджнун» богат своими ономастическими единицами. Исследовании топонимов и этнонимов в поэме имеет большое историческое значение художественного произведения. При исследовании выяснилось что, М.Фузули использует космонимов, зоонимов и фитонимов в различных ситуациях. Все ети особенности описаны в статье и дается этимологические обьяснения некоторым ономастическим единицам.

Ключевые слова: антропоним, топоним, этноним, космоним, фитоним, зооним, ономастическая единица, поема.

ƏDƏBİ DİLDƏ ARXAİKLƏŞMİŞ SİFƏTLƏR QƏRBİ AZƏRBAYCAN ŞİVƏLƏRİNDƏ

Sevinc Sadıqova

Azərbaycan Dövlət Pedaqoji Universiteti

ÖZET

Açar sözlər: dialekt, arxaizm, sifət, ədəbi dil, Azərbaycan dili.

Azərbaycan xalqının əzəli yaşayış məskənlərindən olan Qərbi Azərbaycan (indiki Ermənistan) ərazisində bu gün bir nəfər də olsun azəri türkü qalmamışdır. Mərhələlərlə həyata keçirilən və 1988-ci ildə başa çatan deportasiya nəticəsində İrəvan, Göyçə, Dağ Borçalısı, Ağbaba, Dərələyəz, Zəngəzur mahallarının aborigen əhalisi olan azərbaycan türkləri minilliklər boyunca yaşadıqları dədə-baba torpaqlarından zorla qovulduqdan sonra Azərbaycanın müxtəlif bölgələrində məskunlaşmışlar. Bu proses nəticəsində kompakt yaşayışdan məhrum olduqlarına görə onların dialekt-şivə xüsusiyyətləri getdikcə neytrallaşır. Halbuki Qərbi Azərbaycan dialekt və şivələri zəngin leksik və qrammatik xüsusiyyətlərə malikdir, Azərbaycan dilinin ən qədim dövrlərinin izlərini özündə yaşatmaqdadır ki, bunların da tədqiqi Azərbaycan dilinin tarixinin öyrənilməsi baxımından müstəsna dərəcədə əhəmiyyətlidir.

Qərbi Azərbaycan şivələrində bir sıra leksik vahidlər vardır ki, bunlar tarixən ədəbi dildə də işlək olmuş, sonradan arxaikləşərək ədəbi dildən çıxmış, lakin şivələrdə mühafizə olunmuşdur. Bu yazımızda Qərbi Azərbaycan şivələrində işlənən, ədəbi dildə arxaikləşmiş sifətləri nəzərdən keçirəcəyik.

Qərbi Azərbaycan şivələrində işlənən sifətləri leksik-semantik xüsusiyyətlərinə görə aşağıdakı kimi qruplaşdıra bilərik: 1) İnsana məxsus xarici görkəm və cismani əlamətləri bildirən sifətlər; 2) Xarakter və psixoloji xüsusiyyətləri bildirən sifətlər; 3) Ümumi şəkildə əlamət və keyfiyyət bildirən sifətlər; 4) Heyvanlara aid əlamətləri bildirən sifətlər. Əlbəttə ki, Qərbi Azərbaycan dialekt və şivələrində rəng, dad, ölçü və s. bildirən sifətlər də vardır, lakin bunların içində tarixən ədəbi dildə işlənərək müasir ədəbi dil baxımından arxaikləşmiş leksik vahidlər olmadığına görə tədqiqat obyektimizə daxil deyildir. Bu səbəbdən məqalədə yalnız aşağıdakı sifətləri təhlilə cəlb etmişik:

1.İnsana məxsus xarici görkəm və cismani əlamətləri bildirən sifətlər: alacankeş (yarıcan; İrəvan, Göyçə), anqut (həddindən artıq arıq; İrəvan, Göyçə, Dağ Borçalısı), avırtdax (kök, sifətini ət basmış; Dərələyəz, Zəngəzur), caydax (çox arıq və uzun; İrəvan, Göyçə), ələngə (arıq; Loru-Pəmbək), imirzə (yaraşıqlı; Dağ Borçalısı) və s.

"Yaraşıqlı" mənasında işlənən **imirzə** leksemi "Kitabi-Dədə Qorqud" dastanlarında eyni mənada işlənmişdir:

...bir imirzə xub yigit qırq yigid ilən sağında və solında oturırlar (1.73).

2.Xarakter və psixoloji xüsusiyyətləri bildirən sifətlər: ağzıisti (heç nədən qorxmayan; Dərələyəz), ağzısuyux (sirr saxlaya bilməyən; Göyçə), ağzıbir (sirr saxlayan; İrəvan, Göyçə), aladil (yalançı, hiyləgər; Dağ Borçalısı), alağuz (araqarışdıran, xəbərçi; Ağbaba), alçax// alçaxkönül (təvazökar, Göyçə), asükün (naşükür, hər şeydən narazı; İrəvan), azğıntı (avara; İrəvan), bayanğı (avara, tüfeyli; İrəvan), beçərə (yazıq, fağır; Dağ Borçalısı), beddam (adı pis çıxmış; Dərələyəz, Göyçə), bərraday (tənbəl, avara; Göyçə), burnuyelli (özündənrazı, lovğa; İrəvan, Göyçə), cezvəli (əsəbi, tez özündən çıxan; İrəvan), cələkəsən (fırıldaqçı, hiyləgər; Göyçə, Zəngəzur), cılasın (igid, qoçaq; Göyçə), cıynaxlı (bacarıqlı, qoçaq; İrəvan), cüdam (axmaq, yelbeyin; Dağ Borçalısı, Ağbaba), cüvəllağı (çoxbilmiş, bic; İrəvan), daqqa (özündənrazı, lovğa; Göyçə), dambat (özündənrazı, özünü dartan, lovğa; əksər şivələrdə), darqursax (səbirsiz, hövsələsiz; İrəvan, Göyçə), daşqəfədan (simic, xəsis; İrəvan), davaxor (dalaşqan; Zəngəzur), dənəxor (özgə hesabına yaşayan; İrəvan), dıydıx (yelbeyin, yüngülxasiyyət; İrəvan, Göyçə), dingiş (yüngülxasiyyətli; Zəngəzur), əlləm-qəlləm (kələkbaz, fırıldaqçı; Göyçə), faqqı (kələkbaz, hiyləgər; Göyçə), fasıx (bic; Ağbaba, Göyçə), fəllax (diribaş; İrəvan), göy (xəsis; Göyçə), hul (qanmaz; Göyçə), huydum (yüngülxasiyyətli, yelbeyin; Dərələyəz), hüşdürüm (yüngülxasiyyətli, yelbeyin; İrəvan), mağmın (yazıq, fağır; Göyçə) və s.

Bu leksemlərdən **mağmın** sifəti məğbun fonovariantında, eyni semantika ilə ədəbi dil nümunələrində işlənmişdir:

Ey könül, sənsən məni məğbun edən,
Natəvanü xəstəvü məhzun edən. (2.345).
Yusif nəbi eşidübən məğmum oldı,
Yəqub suçı vida qılıb çıqar imdi (4.170).

Qeyd edək ki, müasir ədəbi dildə işlənən elə sifətlər vardır ki, bunlar tarixən ədəbi dildə, həmçinin Qərbi Azərbaycan dialekt və şivələrində fərqli semantika ilə işlənir. Belə sözlərdən ağır, alçaq sözlərini göstərmək olar. Müasir ədəbi dildə ağır sözü çəki anlamında, alçaq sözü "aşağı", məcazi mənada isə "ləyaqətsiz" mənasında işlənir. Lakin həm tarixən ədəbi dil nümunələrində, həm də Qərbi Azərbaycan dialekt və şivələrində bu sözlər fərqli məna ifadə edir: ağır sözü "hörmətli, samballı", alçaq sözü isə "sadə, təvazökar" (çox zaman alçax könüllü birləşməsi şəklində) mənalarında işlənir; məs.: Qonşumuz Salman dayı ağır kişidi, sözü qılışdan kəsərridi (Dərələyəz); Məhərrəm məllim çox alçax könüllü adamdı (Göyçə).

Bu sözlər ədəbi dil nümunələrində də eyni semantika ilə işlənmişdir:

Yusif sədiq bu əhvalı bəyan bildi,

Ağır xələt geyüridi alıb gəldi (4.123).

Hüsn içində sana manənd olmaya,

Əsli yuca, könlü alçağum bənim (2.25).

3.Ümumi şəkildə əlamət və keyfiyyət bildirən sifətlər: ajar (təzə, işlənməmiş; Göyçə), alaqolay (ortabab, babat; Göyçə), aneyin (əcayib, qəribə; Zəngəzur), cıqqılı (balaca, xırdaca; Göyçə, Dağ Borçalısı), cu:x (duru; İrəvan), ey (yaxşı, əla, gözəl; İrəvan), əcərri (təzə, istifadə olunmamış; Zəngəzur), əssah (dəqiq, doğru; Ağbaba, Göyçə, İrəvan), gidi (vəfasız, etibarsız; Göyçə), qolay (rahat, asan; Göyçə), suşdu//suçlu (günahkar; Göyçə) və s.

Bu leksemlərdən **ey** sözü eyi// iyü fonovariantlarında, suşdu sözü suçlu fonovariantında eyni semantika ilə, **qolay** sözü isə eyni fonosemantika ilə ədəbi dil nümunələrində işlənmişdir:

Aşiqindir zahid, əmma canə qıymır vəqti-kar,

İyü xəyalı özgəvü sevdayi-bazar özgədür. (3.29).

Və əhvalın nətəligin bizdən sorər,

Gərəkməz kim, səni suçlu bilə imdi (4.83).

Andan əvvəl anı kim, yad qılduq idi,

Ol mənidən qolay nicat oldı imdi. (4.114).

4.Qərbi Azərbaycan dialekt və şivələrində heyvanlarla bağlı olaraq, heyvanların müəyyən əlamətini, xüsusiyyətini bildirən qısrağ, qısır, boğaz, qaşqa, təpəl, saqqar və s. sifətlər də işlənir ki, bunlar müasir Azərbaycan ədəbi dilində arxaikləşmişlər, lakin tarixən ədəbi dildə işlək olmuşlar.

Qısrağ//qısrax leksemi Qərbi Azərbaycanın Ağbaba şivəsində "bala verməyən at, doğmayan at, qısır at" mənalarını ifadə edir: "Nəsif bir qısrax alıf, buraxıf Sarı çayırda otdu:ur".

Ədəbi dildə "Kitabi-Dədə Qorqud" dastanında işlənir:

Biŋ dəxi ayğır gətürüŋ kim, heç qısrağa aşmamış ola (1.59);

Biŋ ayğır diləyübdür kim, qısrağa aşmamış ola (1.59);

And içmişəm qısır qısrağa bindigim yoq (1.73);

And içəyim bu gəz boğaz qısrağa bindigim yoq (1.73).

"Qədim türk lüğəti"ndə qisraq "cavan dişi at (bəzən – bala verməyən dişi at)" kimi izah olunmuşdur: "qisir qisraq – bala verməyən dişi at; qiz birlä küräšmä qisraq birlä jarišma – qızla güləşmə, dişi atla yarışma" (5.448). V.V.Radlov bu sözü кыcрак variantında qeydə alaraq "cavan dişi at, hələ doğmayan dişi at, cavan dişi at ilxısı" mənalarında izah etmişdir (6,II,1.812).

Mahmud Kaşğaridə “kısrak igəndi – qısraq boğaz oldu” ifadəsi (7,I.248) və kısrak – gənc qısraq izahı verilmişdir (7,I.459).

